

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

Yıl:1 Sayı: 4 Haziran-Temmuz 1992 (İki Ayda Bir Yayınlanır) Fiyatı: 5000 TL. (KDV Dahil)



- ✓ HEWİSINA ZMÊN KARMENDİYA WELATPERWERİ YE ...
- ✓ SERHILDANA AGIRI...
- ✓ JI NAV KLASİKAN: "FEQİYÊ TEYRAN Û TOLSTOY"
- ✓ ÇİROKA ZEMBİLFROŞ ...

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

SAHİBİ

Mazhar KARA

SORUMLU YAZI İŞLERİ MÜDÜRÜ

Mükerrem AYYILDIZ

YÖNETİM VE YAZIŞMA ADRESİ

İnönü Cad. Kahraman İşhanı

Kat:2 No:13

DİYARBAKIR

TLF/ FAX:136 63

BANKA HESAP NO:

Mazhar KARA Adına
T.C. Ziraat Bankası D.Bakır
Merkez Şubesi
353764 Nolu cari Hesap

ABONE KOŞULLARI

6 AYLIK : 15.000

1 YILLIK : 30.000

İLAN TARİFESİ

Arka Kapak :750.000

iç Kapak :500.000

Tam Sayfa :300.000

Yarım Sayfa :150.000

1/4 Sayfa :75.000

DİZGİ

EZGİ PRODUKSİYON

TLF:455 78 /D.BAKIR

BASKI

BARAN OFSET

İÇİNDEKİLER / NAVEROK

Pêşgotin.....	1
Hewisina Zmên Karmendiya Welatperweri ye.	
CIWAN DILGEŞ.....	2-3
Helbest / Şiir	
BARAN / M.KARA.....	4
Agır û Hêvi	
KRONAHI.....	5
Jı Sala 1979 Hetani Sala 1983 Rewşa Kurdistanana Rojava (1)	
L. ÖZDEMİR.....	6-8
Serhıldana Agiri	
Mükerrem AYYILDIZ.....	9-11
Jı nav Edebiyata Kurdi Ya Klasiki	
A. NÜBAR.....	12-13
Rabın û Bı Ré Kevın (Helbest)	
Ediñ THOMAS.....	14
H.K.D. Büyüyor.....	15-16
Jı Nav Edebiyata Cihanê	
F. ŞEXANI.....	17-18
Tendür	
F. IŞIK.....	19
Helbest	
Salehê Hesen / Cıwan Dilgeş.....	20
Kürt ve Ermeni Edebî İlişkileri	
Kınyaz İbrahim Mirzoev.....	21-23
Çiroka Zembilfroş	
Mehmet EKMEN.....	24-26
Bo Zanin.....	27
Tıştonek	
Xezal SASÛNİ.....	28
Jı Bo Z arokan.....	29-30
Xaçerêz / Pêkeni.....	31
Jı Xwendevanan.....	32
Kek H. Sait Çû Heqiya Xwe.....	33

PÊŞGOTIN

Xwendevanê me yên delal;

Sal û meh dibihore, diherike, wek ava zozanên Kurdistanê. Dî vi kelekeli û herkandîna rojan de, GOVEND ji, bo we xwe dixemilîne.

Wê bûteqe, çiqas dî kuraniya axê da be ji wolqan. Berf wê bihele, tov wê biharê de biqelîşe... Hin gelek koçêbarê dîn û fermanên dîn wê biwelhdine ev ax. Her rojek wê wek çemeke bavê der û jinek nû wê geş bibe, berxwedanek nû...

Dî rewşa iro de, şerê azadî, jîyanê her roj hunek dîn xûrttir û germtir dike. Ji vi xweşî û xûrtbûnê GOVEND ji para xwe digre. Xwedi derketîna wê ya hêja û granbûha para me ye...

Wek tê zanin GOVEND rûpelê xwe ji hejmara sîsiya pêve pîrani ji kurmanci re veqetand. Bo vê yekê rexnê we ji gîşt me. Hinek digotin: "Însanê me bi pîrani Kurdi baş nizanin bixwinin û binivîsinin. Ê bixwinin ji gelek car tînegîjin. Ev rewşa han li ser frotana Govendê de wê tesîrek ne baş çêbike."

Xwendevanên delal; derdê me ne tenê frotana Govendê ye. Hûn ji zanin bi zmanê me yê zîkmaki tu dibîstana me tune ye. Zîmanê me hatiye qeyd kirin, zmanê kurdi zêncirkirîye... Komelê li ser zmanê me ders dide, bi alî hêzên dagrker ve tînegîtin. Bi vi rewşê, wek heval Cîwan DILGEŞ ji dî nav rûpelê Govendê de dibê, "hînbûna zman karmendiyê welatparêziyê ye", lazîme bibe şîarê me. GOVEND bi vi baweriyê, ji vîr pêve ji wê dî nav rûpelê xwe de cihêki fireh bide zmanê Kurdi. Sedemê hebûna me ji ev e.

Iro bi bawerîya me, wezîfa welatparêzan ne sekîn e; lazîme ew, kar û barê xwe yê şoreşvani bi dil û can pêk bîne û bi vi awayî pêşîya hunek tîştên nûh ji veke. Ji vana yek ji zmanê me yê zîkmaki ye. Iro em pêşî li zmanê xwe venekin, sibe em nikarin kar û barên dehi mezin pêk binin.

Bula qet neyê bîrkîrîn, ku "ê kevîr û beran qûl dike ne qewweta avê ye; bê sekîn domdariya dilopan e".

Bi daxwaza hevdiîtinê, dî Govendeki dehi bedew û delal de!...

Bûmin in dî nav xweşiyê de!...

GOVEND

HEWISINA ZMÊN, KARMENDIYA WELATPERWERI YE !

Cıwan DILGEŞ

Bê gumane ku hinkirina zman kareki hêsa nine. Ew bi xwe berpirsiyari, sebr û kedeki qedim dıxwaze. Lewra ku ji birkırın û bışaftına (asimilasyona) zmana ji zû bı zû pêk nayê û qedexe kırına zmana neçariya mêtinkara ye. Ev du hezar sale, ku Dewletên serwer û hov zmanê Kurda qedexe dıkın û ji bo ji holê rakırına zmên û rastiya netewi çı lazım bûye û çı ji destê wan hatiye danepaş nekırına. Lê disa ji tesira wan heyani ciheki-pır hındık-bûye. Wendakırına milletê Kurd û zmanê wi mumkun nebûye.. (İro ji zmanê kurdi ji yê Tırki xwrtır û paqıjtire!)

Disa bê gumane ku dı hebûna netewi de zman cıyeki giranbuha dıgre, lê ev yek nayê wê manê ku zman bı serê xwe milleteki tine meydanê û dıbe sedemê cuhêtiya netewa. Ger zman bı serê xwe netewitiyê damezranda, wê çaxê dı şûna bist dewletên Erebadê dewletek, û mırovên bı ingilizı dı peyvın dé ew ji dı bı Dewletek İngilizde bıgıhiştına hev. Lê disa ji dı nav şertên mıleti de zman û yekitiya zman rola heri mezın dilize.

Em nesla iroyın gelek bı sıûdın ku gelê me zmanê xwe ji zmanê mêtinkara bıyani parastiye û bı xurti heyana roja iroyın ani ye. Biradamın; ev hazar û sé sed sale ku dı mızgeftada Erebi hini zarokên Kurda dıkın, wásna bı pir û pergalê Ereba û islame dıhêvojin, rojê pênc cara lı ser mınara melle bı Erebi banga nımêjê dıke lê kurd hêji nızanın ew dibêje çı! ji xeyni viya; Markırına-zewaca jın û mêra bı Erebi, veşartına mırıya bı Erebi, penc wext nımêj bı Erebi xwendın û nıvisandın bı Erebi lê disa ji Kurd nebûne Erebi. Ew Kurd mane û zmanê xwe û tore û edetê

bav û kalê xwe domandına heta roja iroyın.

İro ji zêde rewş ne guheriye. Mırov dıkare bıbêje ku xerabtır bûye. Ji çar alıva çar dewletên hov û nıjadperıst, bê insf û bê mecal welatê Kurda dagırtına û her yek ji hêleki Kurda dı bışéfın. Ne xasım dewleta Tırk a Kemalıst. Ew dı vé hıngavêde bê hampeye. Ev 70 sale, ku rejıma xwinmıj a Kemalıst a bı navê cumhûriyetê tıştê dı dunyê de nehatiyê kırın ew ji bo Kurda dıkın, ji bo wendakırına rastiya netewi tıştê ne kırına nemaye. İro lı Kurdıstana bakûr dıtınıya rısmi hebûna Kurda inkar dıke. Dıbê "Kurd tunin" ji bo Kurda asimilê bıkın û bıkın Tırk, ji qırbırın kırınê heta nefi kırınê tu nemaye ku nekırına. (cardin); hinkari (exitim) bı Tırki, bernamê radyo û televizyona bı nıjadperestiya Tırka dagırtına û bı zmanê Tırki ne. Rojname lı ser himê bışaftınê bı Tırki dınvısın. Bazar û danû standın bı Tırki. lo! çı tıştê heye bı Tırki ye, lê dısa ji ew ne gıhane armanca xwe. Gelê me tıvınga wan bı wan da teqand û ev tışt hemi bûn sedemê naskırına dujın û tégıhiştına milli.

Ev yek mezinahiya mıletê Kurd û zmanê wi ye. Em bı gelê xwe çıqas bı pesının heqê me ye. Hezar pesındari û eferın ji mıletê Kurd ra, ku esir ketiye lê teslim nebûye! Ev ji raste ku lı dıj nıjadperesta û bışaftına wan gelek xwin hatiye rêtin û gelek ji seri hatına şıkandın, yan na iro rewş wê lı gor dilê qolonyalısta bûya. Kurd û Kurdıstan wê dı nav rûpelê dırokê da veşari bûna.

Bav û kalê me bı qevda xencerê, xwe û welatê xwe parastın û em gıhandına roja iroyın. Ji nuha û pê ve karmendiya mezin

ya me ye. Dîvê em çavê bav û kala û nexasim yên dî ber vê dozê de şehit keti vekiri nehelin û dile wan bî kul nekîn. Zmanê xwe sererrast bîkîn û bî zmanê xwe bîpeyvîn, bîxwîn û bînivîsin. Lewra ku imkanatên me jî yên wan gelek zêdetire...

Zmên hinkirîn wezîfa her kesi ye. Ki ku jî xwe ra bîbê ez Kurdum, hewceye zmanê xwe hinbîke û bîde hinkirîn. Çi zengin û çi faqir, çi liberal hu çi sosyalist, ev wezîfe ya hemû Kurda ye. Jî ber ku zmên netewî ye, ne çini ye (ne sînî ye).

Lê dî vîr de jî barê giran lî ser milê xwendevan, rewşenbîr û şoreşgeran e. Dî doza azadî û serxwebûnê da ki ku xwe pîr dîde pêş wi hêviya mezîn jî xwe dîke, lazîme ew êdî mîqatê be lî xwendîn, nivîsandîn û axaftina xwe. Jî ber ku ew jî civatê re neynîkîn. Rêber û rêzanê civatê ne. Ew kesên ko civat wan jî xwera rêber û pêşevan dîzane, wexta ku ew bî Kurdi nîzanîbîn an xîrab zanîbîn an zanîbîn jî ne peyvîn û ne nivîsîn, ev yek dê lî ser civata pey wan jî tesîrek ne baş bîke û ewê jî gondariya zmanê xwe yê zîkmakî bîkîn. Rastîyekî rewşa tekoşîn şoreşvaniya me jî ewe ku, heta nuha wani hati ye. Lê dîvê em vê rewşê bî guhêzîn. Lewra ku ev rewş ne durîst e.

Em dîbîhîzîn û sah dîkîn ku ronakbîrên me bî pera dîçîn qursê zimanê bîyani. Ango, pera dîdîn û xwe hîni inglîskî, Franskî û ê din dîkîn. Başê, ne xerab e. Ki naxwazê û dî hesîde mala wan xerab e! Gotîna me ne ewe ko çîma hîni zmanê bîyani dîbîn. Lê qasî zmanê bîyani cehda hewîsîna zmanê xwe jî bîkîn. Jî ber ko zmanê dayîka me lî me qedexê kîrîne û ew dî nav mengena asimîlasyona çar dewletan û çar zmanan da ye. Wexta ku zmanê dayîka mîrova jî hev tar û mar be, jî hev bela û lî sinorê wendakîrîne be, wê gavê wezîfa welatperwerîyê û ronakbîrîyê jî ewe ku pêşîyê zmanê dayîka xwe hinbîke.

Wexta mîrovekî jî vê karmendîyê bîreve û here zmanê bîyani hinbîke, bî hundîkayî mîrov dîkare bîbêje ku ev yek gelekî şerm e!

Werîn em vê şermî û şermezarîyê jî ser xwe rakîn. Zmanê dayîka xwe yî xweş û şêrîn hinbîkîn û bîdîn hinkirîn.

(ZMÊN NEBE NABE ÎNSAN)

ZMÊN

xebat û lebat
 agir û hesîn
 dî serîda peyvaxaftîn
 hîn bî hîn
 guherî hovîtî
 pêkhat mîrovîtî
 jî malbata dest pêkîr
 qîlan û qewm û eşîr
 paşê civat û komal
 lî ser wan netew pêkhat
 netewe,
 lî ser xaka bav û kal
 zmên û çand û abor
 tevde govend û dilan
 edet, û tore û stran
 kemlî dara cihan
 insan nîne bê netew
 netew nîne bê zmên
 ey Kurdê Kurmanc û sor û dimîl
 dewlemend û feqîr
 xwenda û ranakbîr
 ger jî bo we armanc e
 rîzgrî û azadî
 şerm e hun dî peyvîn
 bî zmanê Kurdî esîl
 Mem û Zîn û Nubar e
 gelek şêrîn û delal
 wek awzê bulbul û şalûra ne
 ki hîn nebe hîn neke
 ew ne Kurde Kurdperest
 esîl û fêslê wan nîne
 belkî daşkê keran e!

RIYA CEJNÊ NINE RIYA ŞOREŞÊ

Ev maratonek e, ji bir neke
Rê ji berjêr û berjor
Rast û çep saxur û hezaz ın

Ji te ra hêvi û kekelê divê
Divê xwedi ûsûl û erkan bi
Gavê xwe bî hîşyarî bavê

Hostati ne danina xedê ye
Dîvê xwe bî westini
Bihna te teng be, mala te şewiti
Bazûyên xwe xurt ke
Berê ku derkevi meydanê

Bî du hêrsa xwe mekev
ji hunguv şirintir e, lê kor e ew
Ger bihna te qetiya, lî rê mayi
Ger zora te bir tîrsê
Meke qir û vir
Meriv dîkare bî camêri ji bîkeve
Bî qelsî ji

Lî ba me camêri bî kar tê pivan
Bî berxwedan lî genterê dîkeve
Dil bî berjoran da tê cebîrandin

Dîvi kari da
Windakîrî ji heye, mîrî ji
Rêya cejnê nine, rêya şoreşê
Kılama me nivçe bîmine ji
Wê bêjî, temâm bîkî kesên dîn.

BARAN

Jî Kovara Roja Nu

10/1985

YOLDAŞ TENİNDE DAĞLANAN ŞİİR

*"Neye yarar bıçağa değmeyen bilek
Sevgiye ve kurşuna açılmayan yürek"*
Kemal BURKAY

Hangi ismi koyduysam,
hangi rengi
SEN

kölecî roma arenalarında, spartaküs çiçeği,
Kızgın demirinden Kawanın, newroz alevi

Şiirmi dağlayan
bir yoldaş teni
Marxla başlayan emek imgesi;
İnsan emek,
Emek insanın kendisi.

İnsan; emek, düzgün diyalog
ve örgütlenme.

Bir kuş uçsada
Kanatlınsa hayat
Seni görür gibiyim

Hüzün; en insan yanım.
Bir keskin başkalaşım, korkunç yansıma

Dostun tenine değdirdiğim kahkaha
Bir derin sohbet
ya da
Çok boyutlu bir kavga;
Seni duyar gibiyim.

Mazhar KARA

AGIR Û HÊVI

K. Ronahi

"Keyê Xwedêyan Jupiter bî xwe difikire ku merivayeti jî ortê bê helanin. Prometheus ji agir, ku çavkaniya hemû nuvedana teknikê ye, wan rîzgar dîke. Merivên ku xwe bî agir dorlefand û jî agir peroş stend, ew jî xwe rîzgar dikin û jî kevnareti digîjin şarweri. Pêy wi Jupiter, Prometheusê lî zinarek zêncir dîke; lê paşîye de Jupiter tê binketîn, Prometheus jî tê xilas kirin û duweroja merivayeti jî tê parastin.

Meriv bî emilandina pergalan agir kîr bî dagêra xwe û bî wê dagerkirinê, lewardê ku jê ra bo şarweri pêwîste, da saz kirin. Bo wê yekê agir bu nişana zan-yari û hevî ji nişana hunermendi. Hunermend, mina Euphorione yê Goethe ku, wek agirek pêketî berbi esmana va êriş dîke, her dem lî dû tîşte ku nedîve baz dîde, lê dawiyê de bî alikariya peroşa xwe, ew, xewnê bê bîngehî tine dîke rastbînek ber çavan. Hunermend, dibe ku merivên bî wi ra diji wek 'welatê xewna' bêhna wan veke û her wîha meriva ra piştgiri bide û stû bî mercen dora xwe xwar neke. Bî wi awayî tê dîkeve pêla dinê û xewnan jî dîke rastbîn.

Hunermend, pîr çaran jî heşa çêkirinê zêdetir, ne bî têgîha xwe ye, bî tevgeriya çîka dîlê xwe ye. Lê carna jî wek dawîya 'Senfoniya Nehan' da, Beethoven bî wê dîlxweşîya xwe û bî wi awayî ya xwe kare deng bî milyonan meriva bîke. Disa bî wê sedemê, Shelly jî, di 'Rîzgariya Prometheusê di Zêncir' da azadiya cîvata duweroj bî eskereyî daye rave kirin.

Çavkaniya peroşa Beethoven û Shelly, Şoreşa Fransîzî bu; lê neha jî me kî 'Senfoniya Nehan', û 'Rîzgariya Prometheusê di Zêncir' da bî qewata şoreşê kû her derê cihanê veguhertiye jî dîl nebîhise. " (George Thomson, Marksîzm û Helbest)

Îro jî, agir nişana zanyari ye û hevî jî a hunermendi ye. Bî wi sedemê ye ku, di diroka Kurdan de, çandî û hunermendi hatiye talankirin, tuwandin û peyrajî hatiye qedexe kirin. Îro hemû dewlemendiya gele Kurd lî ser navkî din va ye. Daxwaziya wan ewe kû, gelê Kurd bî hiş û meji va peşva nere û haya wan jî tîştîki neve.

Le belê, lî ser axa gele Kurdan de kulilkên çavkaniya hevî û zanyari yê heja hin jî heye. Lî hember hemû kêmasî û zorayî ya wi, ber hemu Kurdan derxistin û pêşvabîrîna wan çavkaniyan wek pêwîstiyek mezin dîsekîne.

Bo Beethoven û Shelly çavkaniya peroşê, Şoreşa Fransîzî bû. Lê bo gelê Kurd çavkaniya peroşê diroka hemû merivayeti û diroka wi ye. Çavkaniya peroşa wi ya

JI SALA 1979 HETANÎ SALA 1983 REWŞA KURDÎSTANA ROJAVA

(1)

L. ÖZDEMİR

Ger mirov dî xewna xwe de ji bîdita bawer nedikîr ku wê rojek were kevnepere-rastiya Şehin-Şahiya Iran ya kevnare û çendin sale ruxa ye. Lê dirok tiştê nişan dîde ku zordari bê dawî nine û her tiştê ewil û axîrê jêra heye. Gelên Îranê, bî taybetî Kurdên Îranê çendin sal dî bî nîrê kevnepereşti û nureşîya zılımkarên Îranê de, gelek êza û zehmet kêşandî. Zindana EVIN dî tarîxa zordestî û êşkencê da bî nav û deng e. Nêzik paytextê Îranê Tehran e. Zindanek pîr mezîn û sext e. Gelek kes dî wê zindana reş u tari da bê dadîge u pîrsin hatine kuştî û darvekirî. Şahê Îranê jî dî nav kêf û seyranê de bî xwîna gelan û pêşveru, demokratên Îranê her tîm bê xem jîya ye. Bî piştîgîrî û alîkariya Împeryalizma Emrika, Îran bîbû wek zindanêkî servekîrî. Balafîra Şah jî zêr çêbûbû. Ser erd û bî erdê Îranê bî çek û teqemenî bû. Emrika rolek nokevi û parêzgerî, ango cendîrmeyî sîpartubu rejîma zordesta Îran ê. Tu heq û mafek, tu azadî û serbestîyek dî destên xebatkar, zehmêtkêş û karkeran de tune bu. Her wîha Kurd jî, jîyanêk dijwar dajotî. Her ku serê xwe lî dijî vê revşa xîrab rakîra, pêra xwe lî pişt deriyê bendixana dîdit. Kurdên Îranê jî, tu carî deshulât-dariya kolêdarên Îranê ne pajîrandînbun û dema mefer û mecal dîditî, serhîldîdan û şer dîkirî. Ev şer her nîha jî, berdewam e; wîsan dîxwîye ku wê demek dîtîr jî,

dewam bîke.

Dî sala 1946'de lî Kurdîstana rojhîlat, dî bî serokatîya Qadî Mihemed de, komarek kurd lî Mehabet ava bû. Lê mîxabe ku ew komara demokratîk, karîbu xwe tenê 11 meh lî ser piyan ragre. Pîştî bî destê kevnepereştan û bî arîkariya Împeryalistan; her wîha bî terkexemiya Yekîtiya Sovyetan, ev komara kurdan hîlweşîya, serok û rêber û endamên komarê hatne ceza kirî. Qadî û hevalên wî hatne darvekirî. Ev roj dî diroka kurdan de ciyek grîng digre, heqê ku ev roj wekî roja biranîna şehîdên kurdîstanaanê bî birê û bî rêz bî. Kurdan, carek dî dema komera Mehabat tam û xweşîya azadî û demokratîyê dîtîbûn, wan nedîxwest ku welêt carek dînbîkeve jêrdest û jîyana bextewer têk here. Herçend lî berxwe dan jî, lê, dijîmî xedar bu û xwedî hêzek giran bû. Kurda tenê bî serê xwe ne kari ku pêşî lî rojên reş bigîrî.

Diyare sala 1979, jîbona kurdan jî, fer-sendek baş bu. Ewana jî dîkariya bî vê buyêrê, jî bona xwe, tiştê baş bî dest bîxî. Kurd jî dî şoreşa Îranê de beşdar bûn û lî gel wan hezên dînbîyan Îranê ku lî dijî Şah serî hîldîdî; bî armanca Îranêk demokrat û Kurdîstanek azad tevî tevgera dijî şahîtiyê bûn. Kurd wê demê jî, çekdarbûn û bî partîzanî şer dîkirî, ango şerê çîrîkî (gerîllayî) dîkirî. Partîya Demokrata Kurdîstan a Îranê jî, dî vî şerî da pêşengîya gelê kurd dîkîr. Qasîmlo'ye nemîr, wek

pêşmergêyêk çeleng, lı welat dı doza aza-
dixwaziya kurd de dixebıta.

Bı rasti dıkarın bêjın ku dı şorişa İranê
da jına rolek gelek mezin leyistın. Himê
şorişa İslami dı muzgeftan de hate avêtın û
dindarên İrani ji, dı vé şorişa mezin da,
ciyê xwe girtın û bûne hêzek pêt. Şah re-
viya. Zêdetır nekari xwe lı humberê lehiya
şoreşê ragre. Lewra roj bı roj ağır geştır
dıbu, lı bircên İranê nişanên rojên nu
dibirıqiyan her hêzek diji koleti, dı
hundavê xwe de, derb û zerbek lı kolada-
riyê dıda. Mıcahidhen PDKI, Xelqê İran,
Tudeh, Pêkar, Fedahiyên Xelqê İran, ekse-
riyet û eqaliyet, Komela, Hizbi Cumhuri
İslami İran û ê dın... Herkes dı warek de,
pêla şorişê firehtır dıkir. Şah dema ku re-
viya, dı şuna xwe de nokereki bı navê Bex-
tiyar ani ser kar. Lê raperin û serhıldana
gel, seranser geş dıbu, germ dıbu û
nedişekınya. Bı sedan jêrzemin û
kuwarên çek û teqemeniyên Emrikayi, bı
destê xelkê ket. Bı sedan milyon gulle, bı
sedin hezar tıng û çekên dın, weki xeni-
met kete destê şoreşvanan. Edi, her kesek
xwedi çek û rext ji bû û xwe bı çekdari
dıparast. Demêk şında Bextiyar ji reviya.
Xumeyni vejeriya İran û dest bı
xwepêşandinên mezin kır. Bı rasti ji, bili
kurda hemû gelên İranê bı çavek xılasker
lı Xumeyni mêze dıkirın. Xumeyni roj bı
roj xurtır dıbu û lı dawiyê beyan kır ku lı
İran komarek İslami saz dıbe. Sedem ku
gel, ji destê zılma Şah bê zar bıbu, hema bı
dawa Xumeyni girtın û wi anine ser kar.
Pêş hemi kesi kurd û paşın hemû gelên
dın, cevenêrên sazumenek demokrat û
mırovpewer bûn. Xumeyni, hetani ku ciyê
xwe baş bigre, mırovek lıberal ani xıste se-
rokkomar. Ev mırov Beni Sedr bû. Dı sere-
raskırına hıumatê di ji, çend nexşên
piçuk dane destê Tudehiya. Kiya Nûri,
serekê Partiya Kominista İranê Tudeh bû.
Kiya Nûri, lı benda Xumeyni, dı avakırına

dewleta nûda, bı dıl û can xebıti. Demek
kurd derbaz bû. Leşkerên ordiya İranê ji,
derbazi refên şorişvanan bûn. Destek
piçûk, ji bona parastına mafê Şahitiyê,
demek piçuk lı berxwe dan, lê fêda nekır,
ewana ji xwe zû dane ali. Lê lı Kurdıstana
Rojava, gelê kurd ji, lı berxwe dıda. Dax-
waznameyek 6 bendi geyıştandine Xumey-
ni. kurdan xweseri û demokrası dixwestın.
Dı çarçava xwestekê xwe da, amade bûna
xwe ji bo pıştgırıya şoreşa İranê beyan
dıkirın û dixwestın ku dewletek demokrat
lı İranê damezrın, hemû gelên İranê bı
birati û aşiti û wekhevi têde bıjin. Dewletek
serbıxwe nedixwestın. Xwemuxtari û oto-
nomi dixwestın. Ev tışt ji, ne hewqas zeh-
met bu û şoreşa İranê ji bı vi tıştı têk ne
dıçû. Lê Xumeyni û hevkarên wi daxwa-
ziyên kurda qebûl nekırın. Lı ser vé yekê
kurda ji beyan kır ku, wê dest bı şerê
çekdari bıkın. Gazi gelê kurd kırın ku
çıqas çek û teqemeni ji Kurdıstanê bı dest
dıkeve nedine Hêzên Xumeyni û ji xwe re
hılınin. Xumeyni, hêj dı destpêkê de ji, ji
Partiya Demokrat ne qayıl bu, ewi dixwest
ku insiyatifet gırêdayi pırsa Kurdi veşere.
Şêx İzedin Huseyni naskır û weki mela
ûserokê Kurda da nasın. Şêx İzedin ji bı
rêyek aşiti dixwest ku kurd ji bı gêjine
heqên xwe. Lê ew ji dındarek bû, pêş hemi
tıştı islamiyetê dı parast. Parti bı Şêx re
runışt, bernameyeki neteweyi pêşniyar kır.
Lê ev bıryar bırewe neçûn. Şêx ne xwedi
têgrêdapêk bu. Lê kurda, dısan ji jêra siya-
net dıkir, ne dixwestın ku, bı kevıne diji
hev, birati xıra nebe. Şêx İzedin, weki gel
dixwest ne lıbiti. Lı gelek ciya, nexwest ku
kurd lı humberê hêrişên leşkeri xwe bı
parêzın. Gazi kır ku her kes çekê xwe
deyne u xwe tehwilli dewleta nû bıke.
Sedem wê yekê, qedr û qımet û siyaneta
Şêx dı nav gel de, roj bı roj kêmbû, paşi Şêx
xwe da kınareki û bû temaşekar.

Beni El Sedr ji, dı İranê de mırovek

xwedi hêz û rêxistîn nebû. Lî dijê Şah bû, ewi ji, dîxwest ku dî vê rewşê de bibe xwedi hêz. Dî şoreşa Îranê de, yekem hêza mezîn ya Hîzbi Cûmhûri Îslami bû. Ji çekdarên wan re pastar dîhate gotin. Pastar, weki hêzek bergiri millî bûn û ji nav şoreşvanan hatîbune bijartin, dîlsoz û canfida bun. Pastar, bî bûne amîrhêz û fermandarên leşkerên Îran ji. Ew bîbûne parêzgerên Îrana nû. Pîştî pastaran mezîntirîn hêz ya Sazûmana Mîcahidên Xelkê Îran bu. Nêzîki si-çil hezar aligîrên vê sazûmanê hebun. Ewana ji, serê ewil lî gel Xumeyni bî dîlsozi şer kîrîn. Ewan ji rejîmek Îslami dîxwestîn. Dî navbera wan û pastaran de tu ferqeki mezîn ji tu nê bû. Hevalbendiya hev dîkîrîn. Dî payêkîrîna dewleta nû de, bî dayînen Xumeyni qîma xwe nanîn. Zêdetîr tîşt xwestîn. Xumeyni qebul nekîr. Sedem vê yekê ji, navbera wan û ya Pastaran xîrabu û lî ber hev rabûn. Paşî refên xwe, ji arîkariya Xumeyni kîşandîn û xwe dane derveyê kîrîyarên Xumeyni. Wê demê pastar ji ketne baraleyhê wan, ci bî ci dî navbera wan de lî Zanîşka Tahranê, lî ser şeqeman, şerê kolan destpêkir. Mîcahit, roj bî roj lî dijê Pastaran dijwartîr bûn.

Serokkomarê dewleta Îslami Beni Sadr bî Fermanê Xumeyni ordu û çekdarên Îranê bî tevayî ajotîne ser Kurdistanê. Serokkomar Hesen wîha dîgot: "Leşkero, çekdarno, da ku lî Kurdistan û asîman bî erdêre nekne yek, potînen xwe dernexîn. da ku 'ziddî-inqîlabîyan' dîşoreş hemu neyêne kuştîn û êsir kîrîn, jî Kurdistan venegerîn."

Lî ser vê ye kê, şerê kê tund û dijwar lî êniya Kurdistanê destpêkir. Ev şer dî navbera pêşmerga û xwînrêja de bû, ev şer, şerê man û ne manê bû. Partî, jî aliyêk ve şer dîkîr jî aliyê dîn va ji, xwe jî bo duwerojê amade dîkîr. Gazi wan kêsen kurd û welatparêz dîkîr ku lî himberê gelê kurd şer

nekîn, berevac werîn bî şanazî dî refên kurda de ci bîgrîn û lî dîji zîlma Xumeyni, dî eniyek pêşverû û demokratîk de hêzek seranserî pêk binîn Gelek kurdên welathîz ku dî orduya Îranê da leşker bûn bî çekên xwe hatîn tevî pêşmergeyan bûn. Pîraniya wan pîspor û lêzanê leşkerî bûn. Weki sergurt Ebasi, Serwan Çeko, Sergurt Aliyar, Kak Hejar û êdîn. Dî vê demê de bî rasti ji, emeg û xebata Mela Mihemedê Cîwanru, Baba Gewre û Sergurt Ebasi qet nayê jîbir kîrîn. Sergurt Ebasi topavêjek gelek jêhati bû. Bîkîrê gîrtîye ku weki eskortê wi lî cem dîma, rojeki Sergurt bî xîyanetî kuşt. Ev, yekem derba gîran bu ku kurdan jî aliyê leşkerî ve dîxwar. mela Mihemedê Cîwanru ji, orduya pêşmerga lî Kurdistanê sererast kîr, taktîkên şer û xwe parastîne hîni pêşmergan dîkîr. Kak Hejar ji, bî rasti qehremanek gelek mezîn bû. Her wîha Serwan Çeko û Sergurt Aliyar ji, pîsporên gelek başbûn.

Bî hêrişên hêzên dewletî, lî Kurdistan şer her roj dijwartîr dîbuya. Ev şerê ewil, dijîmîn poşman kîr. Lewra dijîmîn şîkestêki mezîn xwar. Paşî agîrbîrîn îlan bû û leşkerê Îran bî paşve kîşîya. Kurd gelek dîlşabûn lewra serketîn ya kurda bû. Xumeyni sê bendên pêşniyarên kurda qebûl kîr. Lê ev ne besî kurdê Îran bû. Lewra hîkma Îranê ji serê kurdan kêm nedîbuya. Xumeyni dîgot çekên xwe deynîn û werîn, bîla orduya Îranê lî navçe parêzgerî bîke. Partî ji, vî tîştî qebûl nedîkîr lewra bawerîya Partiyê bî qewlê Xumeyni ne dîhat, wî dîzaniya ku Xumeyni ne dost e, neyare û bext ji, jî neyare re tune. Demeki dîrêj, weki salek kurd lî welêt serbest jîyan. Jmara pêşmergeyên PDKî geyîşte nêzîki 10 hezaran. endamên partiyê ji, weki 40 hezari bun û her endamêk partiyê xwe bê teklîf pêşmerge hîsab dîkîr, dî şeran de tîfing heldîgîrt û dî çû eniya şer.

(Dûmahîk dî hejmarek dîn de)

SERHILDANA AGIRI

Mükerrem AYYILDIZ

"Pişti vemırandına serihıldana 1925'a, kalê Şêx Seid û bî seda hevalên wi, ên bijare û rêber lı dadıgaha Dıyarbekrê û Palo yê a bî navê "İstiklal Mahkemesi" de hatın dardakırın. Bî seda gund û bajêr kevil û wêran bûn. 27000 kes hatın kuştın. Jı her aliyê welêt bî koçemali Kurda ajotın bî nav Tırkiyê. Cara ewıl berxwedaniyê lı dorhêla Agiriyê dı vi dema nefî bûnê da dest pêkir. "(1)

Dı navbera salên 1925-28 da bilançoya gundên hatine wêrankırın û mırovên têda hatine qetilkırın bî hındıkayi wanine: (2)

HERÊMI	JIMARA GUNDA	JIMARA MALÊN WÊRANKIRI	XELKÊ TÊDE HATI QETILKI
Licê	30	1284	1284
Darahênê	54	2197	2197
Erdoşın	127	125	125
Çapakçûr	10	440	440
Nisêbin	11	576	576
Habap	21	905	905
Eliyan	19	790	790
Midyad	6	450	450
Baxçerın	15	548	548
Kerboran	3	72	72
Hesenkêf	3	138	138
Gêncê	16	643	643
Ifnot	13	590	590
Dıyarbekır	9	138	138
TEVAHI	206	8758	15202 (x)

Mırovê jı ber qetliam û nefiyê dıfılıtın, ew gund û malê xwe dı terıkırın. Ber bî çiyayê bılınd ve dıkışın. Lewra ku çiya êdi bî sitar û ewle dı bınn. Bırek jı wan dı riya Erzerûmê da bî jendırma re şer dıkın û yê jı destê jon-Tırka dıfılıtın xwe davêjın hemêza çiyayê Agiri! Dı nav wanda Haski Tello jı heye. Haski Tello, Yek jı wan serokê berxwedana Agiriyê ye...

Jı bo yekiti ya hêz û eşirên Kurda peywendi û destdani lı gel rêxustına jı 1925'a ve dest pêkirı ye. Dı destpêka bıhara 1927 da lı Kurdistan komcıvinek pêk tê. Dı vê komcıvinê da yekitiya armanc û tevgerê tê stendın û dest bî xebatê tê kırın.

Bı vê armancê, roja 5' ê Çıriya Pêşına 1927'a Kurdistan Teali Cemiyeti, Kurd Teşkilat-ı İstımaiye Cemiyeti, Kurd Millet Fırkası û Kurd İstiklal Komitesi dı bın navê XOYBÛN da yekitiya netewa Kurd damezrin in.

Jı 1927'a û pêve daw û doza xelasiya netewa Kurd dı bın pêşevaniya XOYBÛNê da heta meşandın. XOYBÛN, dı hêla zanin û hışyariya netewida valahiki mezm teji kır. Pêşengiya XOYBÛNê baweriya hêl û malbatê Kurda êdi qewi kır û şerê azadî û serxwebûnê geş kır. XOYBÛN, jı bo propoxanda û ajitasyonê 2 kovar derhani: Hawar û Ronahi.

Tevgera Agiri roj bı roj firehtır û mezintır dıbe. Ev yek jı pêşengiyeki xurt dıvê. İhsan Nûri (ku dema serihıldane Şex Said dı arteşa Tırk'da serpey 'yüzbaşı' bû) û

tevi selefa xwe lı rex serhıldana cih gırtıbu) bo sazumankariya (organiza-syona) tevgerê şiyandin Agri yê.

Sala 1928 da dı navbera serokvana gışti û Xoybûn da şerê propaxendê dest pêkir. Serokvana gışti, dı belavokên xweda rave dıke ku "ewê efûki gışti derêxe, jı serida Kurdistan ava bıke, rê û av û elektrîkê bine Kurdistan.." Xoybûn ji dı belavokên xwe da her lı ser durûti, fêlbazi û derewên Tırka dısekın e û jı diroka fêlbaza misala nişani xelkê dıde. İhsan Nûri ji dı rojnama kokın navê Agri derdêxe û dı belavokên xwe da lı ser vê rewşê gelek dısekın e. Yek jı wan belavokên kı jı teref (ali) dewleta Tırki ve lı dorhêla Agri û Çolemêrgê belavbunê ewha dibê je:

"Gelî hemwelatiya; Hukumeta komara Tırkiyê bı bıryar e ku welatê me yê eziz Kurdistan Tırkiyê jı nuh da ava bıke û têxe ciyê şarezayi û medeniyetê. Rê û kolan dê werın qır kırın, dı nava gund û bajara da riya rêhesini (demiryolû) were vegirtın. Gundê bê xwendegêh, zarokên bê xwendın û dersdar dê nemının. Jı bo ewlekariya can, mal û namûsa gel hukumeta me, dı cendeki mezında ye. Jıyan eki xweş û hemdemi dê jı bo me teva bête ava kırın..." (4)

Netewa Kurd, van çiroka gelek gohdari kırı bû û pırê cara jı pê hatı bû xapandın. Lê ev car van derewana tesir lı kesê nekır. Lewra ku lı serê rêxistinê honanek wek Xoybûn dıkşine. Pışti ev weadên bı derew jı neçûn seri, rayedarê hukumetê mecbûri pevditinê bûn. Pevdıtın dı İlona 1928 da dı navbera nûnerên hukumeta Tırk ku lı ser navê

Xoybûnê bı İhsan Nûri re dest pê kır. Dewleta Tırk dı seri da ne durıst bû. Ewan dıl hebû ku İhsan Nûri bıxapının, bıkıрын û tevgerê cerek di jı pışt da xencer bıkıрын. Lê ev car wani nebû. İhsan Nûri ne mırovê bı hata xapandın û ixanet dûri karakterê wi bû. Ewi bı bıryar û ser bılındı lı hember rayedarê hukumetê mafê gelê xwe û tevgera wi temsil kır. Dı wê navê da serokê eşireta Celaliya İbrahim Haski Têllo lı ser navê Xoybûnê idara heremên rızgarkırı a sıvıl stand destê xwe, heremên rızgarkırı dı 1929 da heta Bakûrê Bıdlis û Wanê fıreh bû bû.

Rayedarê Tırka tégıhiştın ku kırına İhsan Nûri ne hêsa ye. Ew jı xwe dı seri da ne jı bo lı hev kırine ku aştiyê hatıbûn ba hev. Nûnerên hukumetê bı destê vala vegeriyan Enqerê. Dı hezirana 1930 da hukumeta İsmet Paşa bıryara êrişbazıya leşkeri da.. Jı 11 Heziranê heta 12 dê Temmûzê êrişê artêşa dagırker jı hev neqetıyan. Dı vi şeri da hêzên Kurda dı bı seroktıya İhsan Nûrida 1700 leşker êsir gırtın, 12 balefırê Tırka xıstın, 24 top û 600 tıvingê makineli jı jı dijının zeft kırın.

Dı vi şeri da ewantaja hêzê Kurda ê mezin ew bû ku pıştgırıya xwe lı ser tıxûmê İranê da dıgırtın. Tevger çıqas çû fıreh û mezin bû. Artêşa Tırk a bı nav û deng (!) jı hev taro-maró û bê çare mabû. Hukumeta Tırk lı gel İranê û tékılatıya xwe xwırt kır û dijınına bı bêbextı jı pışt va disa lı Kurda xıstın. SSCB ê û İranê Agrıya pıçúk da Tırka û Tırka dı ewêza wi da deşta Bazidê bı destê İranê va berdan. Pışti vê yekê ku tékılıyên Kurda û dınya jı hev tê bırandın dı nav rêxistinê da du

ditiniyê ji hev cihê peyda dibe. Sal, 1931, Hasko Telo bi birek hevalên xwe ve çêtar dibinin ku li Agiri yê bîminin û şer berdewam kîn. Îhsan Nûri û bi hinek hevalên xwe çepera artêşa Tirk di qelêşin û derbasi Îranê dîvin... Ango domandina şer bê feyde di binin.

Çend xusûsiyet di derheq vê serhildanê da hene ku, girînge bête zanin. Ya yekemin ev e ku; di destpêka tevgerê da kurda bine bir ku, yekitiya netewi pêk neye, serkeftin ji pêk nayê B1 vê bir û baweriyê komcivinekî li Kurdîstan hat damezirandin û Xoybûn pêk anin.

Ya duwemin; Qitûta (tawrê) yekitiya Sovyetê ye. Yekitiya Sovyet li gor ditiniyê TKP'ê tevgera netewa Kurda dibine û ewan tevkarê emperyalista di hesabine, yek ji sedemê weha ditinê Sovyetê ji ev e ku Ingliz û Tirk dijberê hevîn û navbera wan xweş nine. Bê şik rast e ku Ingliz emperyalist in û dijberitiya wan pêwist e. Lê dijmaniya Tırka li hember Ingliza, ne têkoşina" diji emperyalizmê ye, gengeşiya li ser mafên emperyalisti ye. Ango mîrov di kare bi bêje ku şerê Ingliz û Tırka li herêma me û bi taybeti li Ser Kurdîstan, şerê parvekîrîne ye. Yekitiya Sovyet her di vê ditinê daye ku "dijmîne dijminê min dostê min e." Ji ber ku Tirk dijminê Inglisane dîvê dostê Sovyetê bêne ditin. Weki me di serideji got yê nê ditiniyê li gel Sovyetê peyda dike qitûta TKP'ê û "sosyalistên" Tırka ye. Di vê pêvajoyêda "sosyalistên" Tırka li dû Kemalizmê ne û karû barê li ser navê sosyalizmê ji wanên tê xwestin, ew jê gelekî dû in.

Di şûna ku bê qeyd û şert mafê netewa bîndesti, netewi û demokratiki bi parêzin, ew ji bi Kemalîstan re tevgerên Kurda dîvemîrand in..

Ya sêyemin: Qitûta Îranê. (xxx) ji bo Hêzên tevgera Agiri, Agiriya Pîçûk çiyeki girîng tiji dike. Beri destpêkê û di nava tevgerêda hezên Kurda vedikîşin. Agiriya pîçûk, cebîlxane û erzaqa xwe temin dikin û vedigerin eniya şeri. Agiriya pîçûk ji vê bonê çiyeki stratejik tije dike ji bo rêxistina Agiriye. Pîştî ku serhildan a Kurd a li Kurdîstana bakûr ber bi serkeftinê dîçe, nerihetî dikeve Îranê ji Lewra ko, Iran ji naxwaze kurdîstan ava bi be. Pîştî vê yekê diplomatên Sovyet û Tirk li gel Îranê peywendiyê xwe zêde dikin û tixûmê (sinorê) nava Îran û Tirkîye - ku di nav Kurdîstan da yeji nuha ser û ber dikin. Li gor vê serû ber kirinê; Agiriya pîçûk dikeve nav tixûmê Tırka û li hemberê wi latek erdê pîr bi rûmet ji deşta Bazidê Tirk bi Îranê ve berdîdîn. Ev yek ji dibe xeletiya Xoybûnê yi en mezîn ku rêxistina şerê netewi tenê li herêmekî -Agiriye- pêk tinin û wek serhildana Rewandûzê û Şêx Ubeydulah tevgera Agiri ji disa dînav di dewletên mêtinkar ve (Îran û Tirkîye) têne pelçiqandin.

Ev çewtiya himi iro ji ji nav tevgerên kurda ranebûye.

ÇAVKANIYÊN VÊ NIVISÊ:

1-Kemal Burkay; Metinkar Karîna Kurdîstan û Tevgerên Netewê Kurd. R.106-107

2-Dr.Bleth Chirpuh; La questin Kurde (Pirsa Kurd) Kahire 1930 R.52. ye welgerandî, Rambout; weşanên Rohani R.7

X Ev hejmar ên ko hatine tesbit kirin. An na taştê tê gotin 30.000 kesin

3-L.Rambout; p.n.d.R.38

4.A.M.Hamilton; Road Threcugh. Kurdistan, London-1937 R.285-96

5-Bi belgeyên ingliza de li Tirkîye "pirsa Kurdî". Weşanên weziratiya kar û barên derwaşi welêt ya Tirkîye, sal 1975.

XX-Di derheq peywendî û nivisanên vê diplomasiyê da binêrîn pirtûka Bilal N.Şimşir

FEQIYE TEYRAN

(1590-1660)

A.NÛBAR

Dı nav hozanên kurdi yên kevn da, yên ku lı Kurdistanê baş tên naskırın, yek jı wan jı Feqiyê Teyran e. Bı ihtimaleke mezın xelkê bı xwe ev nav lı wi kırıyı. Navê wi yê rasti Mihemed e. Ew jı dorhêla Hekariya (Çolemerg) jı qeseba Muqsê ye.

Jı sedsalan vırda ew bı laqabê "Feqiyê Teyran", lı ser zar û zımanê gelê me geriyaye, jı nıvşan derbasi nıvşan bûye. Gelê Kurd ew jı xwe ra gelekı nêzik ditiye û jê hezkırıye. Jı ber ku helbest, beyt û xweşxanên wi bı kurmanciyeke vekırı û gelek caran lı ser jiyana xelkê hatine gotın. Ew bı xurtı lı dıji zulm û kedxwariya mir û derebegan derdıkeve. Feqiyê Teyran bı sedsalan beri niha bı çaveki materiyalist lı jıyanê û lı paşeroja mırovatiyê nihêriye. Ê wi hın jı wê çaxê ditiye ku paşeroja mırovatiyê ronahi ye, bivê nevé dawıya zulmê wê rojekê bê. Dı rıstên xwe da, wi ev baweriya han weha anıye zıman:

Jı niha ve bêje, baweri jı der û dor
rojek dê azadi bê rûyê dınê.

Ê derbazbın rojên xefür
Ê bën rojên qenc ên kıbir
Xwe re bıkın ra û tevdir
Hêsir nebın ber zulma mir.

Dı navber berhemên Feqiyê Teyran û zargotına (edebiyata anonim) kurdi da pêwendiyên xurt hene, wi gelek caran nımûyên edebiyata anonim jı efrandinên xwe ra kırıye bıngêh. Herweha gelek beyt û xweşxanên wi jı ketine nav zargotına me. Hın helbestên wi bûne stran û dı naav xelkê da hatine gotın.

Helbestên Feqiyê Teyran, bı şewayê nıvisandına xwe, wezn û naveroka xwe nêziki edebiyata xelkê ne. Jı ber vê yekê jı gelek helbest û stranên ku dı nav xelkê da tên hesabkırın. Heta niha tenê lı Sovyetistanê, dı nav Kurdên Ermenistanê da gelek helbest û stran hatie berhevıkırın û bûne kıtêb û lı ser navê Feqiyê Teyran hatine çapkırın. (Bnr. Qanatê Kurdo, Tarixa Edebiyata Kurdi, Cild 1, rûp 72)

Wek nımûne em lı jêrê helbestek Feqiyê Teyran û şaxê wê yê folklori bıdın ber hev:

Feqiyê Teyran

Ruhniya fındê gıhıştê
Horiya bukra bıhıştê
Dı lı ser banê kınıştê
Di ko keç ban dıkıtê
Dı neva xelwete ew dın dıbû
Tıji dımaxe xûn dıbû
Şehba sıpi rengin dıbû

Ew hal û reng qet jê ne tê
Ehlê teriq, ehlê sîlûk
Her çî mezin, her çî biçûk
Axa û xewance û mlûk
Pîrsine lî Şêx zehmetê.

Strana Xelkê

Ronaya fîndê gîhîştê
Horia bîkûra bîhoştê
Şêx dî ser banê kenîştê
Şêx batni bang bîketê
Şex xewné da din dibû

Tîji dîmaxa xûn dibû
Sêva sîpi rengin dibû
Ax dûre roja wi bê
Ehlê teriz ehlê mlûk
Hîndî mezin çendî çûk
Xocê Şêx dîkîn pîrsiyarê.
Hemû Şêx dîkîn pîrsiyarê.

(Dr. M.B. Rûdenko, F. Teyran, Şêx Sen'an,
rûp. 15)

BERHEMÊN FEQIYE TEYRAN

Efrandinên Feqiyê Teyran, yên ku iro tén zanin evîn: "Şêx Sen'an", "Qewlê Hespê Reş" û "Ber Sis". Bîli van hîn helbestên din û namayên wi jî Melayê Cızîri ra hene. Lêger û edebiyatnas lî ser hemfikir in ku ev eserên han yên Feqiyê Teyran in. Lê ev hozanê Edebiyata Kurdi ya kevn, iro jî babetê lêgerin û lêkolîneye.

Ew jî hemû aliyan va baş derneketiye ronahiyê.

Şêx Sen'an (Şêxê Sedanya), dî folklorê kurdi da wek destana "Dota Gurca" tê naskirin û gotin. Feqiyê Teyran, ew çîrokdostana han ku jî berêda dî nav gelê kurd û gelên cîran da dîhate gotin, bî rengê bedewî, bî qayde, form û kêş û qafiya edebî hûnandiye û navê "Şex Sen'an" lêkiriye.

Feqiyê Teyran, ev dî sala 1030 (hucrî) da nivisiye. Jî 313 mîsra ne. Dî efrandinê xwe da, Feqiyê Teyran weznê Hezac bî kar tîne,

ku ev wezn nêzîkî zargotîna kurdi "4+4" e.

Şêx Senan cara pêşîn sala 1965'an lî Moskavayê hat çapkîrîn. Ew bî destê Dr. Margarita Barisnova Rûdenko hatiye amadkîrîn û bî lénihêrin û serdariya Prof. Qanatê Kurdo hatiye çapkîrîn. Her ew çap dî sala 1986'an da, bî wergera tipên latîni, ku jî aliyê Memo Yetkin hatiye amadkîrîn, dî nav Weşanên Roja Nû da derketiye.

(Ev nivîsara cara yekemîn dî kovara Roja Nû de hatiye weşandin)

GÜNLÜK TABLO

İnsan;
Yaşam; Felsefe ve ölüm.
İşçi;
Makina, çark, yanık yağ
Kaza, komik ücret
Sendikal hak, grev
Artı, işveren ve lokavt.
Patron;
Şampanya, havyar
Milyarlık tablo
Mücevher, metres
Yalı ve limuzin.
Fabrika;
Makinalar harf düzeni almış.
Ölüm vitrinde
ve onlar en alttakiler
Çılgık;
İsyan değil
vücudun tepkileri
diyettir kesik kol
Sonuç;
Sigorta, evrak, dosya mahkeme
Vergilendirilmiş kutsal
kazanç
ve çağ atlayan bir ülke,
kesik kol
ve pıhtılaşmış kan...

Aziz ADSIZ

RABIN Û BI RÊ KEVIN

Gelê bê can, gelê bê zıman
Gelê veşarti, gelê bırçı
Lı ser wi giraniya zınarek mezin
Û lı ser dilê wi
Gelê nav kuçan da, nav erdan da
Gelê kû lı rêzên ber fırotgehan da ne
Yên kû bı zikê bırçı dı sayiyê da digern
Yên kû her roj bı solên ji dar
Metroyan suwâr dibın
Yên kû dı rojekê bıharê ji pacê vekırı da
Pirtukan dıxwinın mina kû direviyan

Gelê Frensız, gelê Romen
Gelê Bulxar, Yewnan
Gelê Sırp û tu gelê German
Ewê roj kingê bê?
Qey navê azadi nemaye êdi.
Mina jineki tê hezkırın
Her roj zêdetır qênc bû.

Azadiya ku Şatoyan xılas dıkır
Dasan radıkır ber bı perê esmanan
Û tar û mar dıkır dadmendiya derewin
Qey navê azadi nemaye êdi
Dı wi sıveyi da bona te.

Gelê binê barê bédengi
Gelê bı lêvan dalıqandi
Gelê bı per û baskê şıkesti
Gelê kû dı bin sapokên ku dır dıketın?
Laşê wi pê dıhat pêdan
Bes tenê çırûsk ji wê der dıkeve
Û mina mezêlê lı Lazare
Jı we pêştır kesek nıkare bıvê je.
Jı we pêştır kesek nıkare bıvê je.
"Rabın û bı rê kevin"

Edith Thomas
(Werger: Bijar SERDIL)

YARIM BIRAKTIRILMIŞ BİR TÜRKÜNÜN OKUNMAMIŞ YARISI;

H.K.D. BÜYÜYOR

Bir türkünün söylenmemiş yarısındaız... Avuçlarımızda, ekmeğin aklığındaki nasırlı avuçlarımızda güzelleşecek, büyüyüp boy verecek olan o eksik bıraktırılmış, zorbalarca kanatılmış türkümüzün son yarısıdır okuduğumuz. Kıran resimlerinin örttüğü koca bir tarihin ak bir sayfası olmak isteyenlerin okuduğu, dünyayı tepeden tırnağa değiştirmek isteyenlerin türküsü. Belki de yüzyıllara sığmaz olan öfkemin çığığı.

Bu coşkunun zenginliğinde, Diyarbakır Valiliğine 5.1.1992'de yaptıkları başvuru ile H.K.D.'nin (Halk Kültür Derneği)'nin kuruluşunu kamuoyuna deklere eden H.K.D. kurucular kurulu, bunun hemen ardından, bini aşkın bir kitlenin katılımıyla gerçekleştirdikleri açılış töreni ile aynı zamanda ilk fiili etkinliklerinden ilkinde de gerçekleştirmiş oldular. Bunu izleyen günlerde, korkunç bir talan ve kıyım iklimini yaşamakta olan halk kültür değerlerimizi, usul usul yeneden dokuma uğraşına, usta bir dokunuş, bilinçli bir dalış yaptılar.

Şimdi, emeği ile insanlaşan, direnerek insan olmanın tadında kendine ulaşarak güzelleşen, sömürgeci birlikların, kıyım ve talanın dayandığı ge-

rici şoven ve asimilasyoncu politikalar-dan derin bir kopuşu ve bu uğursuz politikalara karşı, devrimci bir karşı koyuşu ifade eden yeni bir insan tipini soluklamaya başladı H.K.D.

İşte bu noktada H.K.D., bu güzel insanların yaratmaya çalıştıkları, o güzel, özgür dünya ve ülke mücadelesinde demokratik bir direnme noktası olma kararlılığındadır.

H.K.D kendi kuruluşu ile yaşıt olan eğitsel ve kültürel çalışmalarını aynı coşku yoğunluğunda azimle yürütmektedir. H.K.D. dergimiz Govend'e sunduğu değerli katkıların yanısıra gerici şoven ve asimilasyoncu politikalarla giderek silikleştirme ve içeriksizleştirmeye doğru itilen folklorik halk oyunlarımızı, tiyatromuzu, müziğimizi v.b. ulusal kültür ve sanat değerlerimizi, kendi öz içeriğine uygun kültür ve sanatın evrensel ölçüleri içerisinde yaşatmaya ve geliştirmeye çalışmaktadır.

Halkımızın sahiplenmesiyle hergün biraz daha büyüyen H.K.D.'nin çalışma birimleri giderek güçlenip yetkinleşmektedirler.

Bu sayımızda H.K.D.'nin çalışma birimlerinden birisi olan folklor biriminin çalışma raporunu yayınlayacağız.



H.K.D Folklor ekibi bir gösteri sırasında

FOLKLOR BİRİMİNİN RAPORUDUR.

Biz halk oyunları çalışmalarını organize eden birim olarak hedeflerimizi, şu şekilde belirledik.

1- Halkımızın özgürlük mücadelesinin ayrılmaz bir parçası, kültürümüzün bir kesiti olan halk oyunlarımızı asimilasyoncu politikalardan kopartarak kendi öz benliğine uygun gelişmesine yardımcı olmak, geleceğe aktarmak.

2-Asimilasyoncu politikaların birer uzantısı olan Halk Eğitim Gençlik Merkezlerinin ve kimi derneklerin belirli kalıplar içerisine soktukları halk oyunlarımızın önündeki engeli yıkmak.

3- Kürt Halk Oyunlarını Türk halk oyunlarımızı gibi sergileyen talancı anlayışlara karşı savaşım vermek.

4- Çok önemli olduğuna inandığımız ve başından beri savunduğumuz "KÜLTÜRLER YARIŞTIRILAMAZ" ilke-mizi kamuoyunun nezdinde kültürün evrensel boyutları çerçevesinde savunmak ve bu tür organizasyonları kınamak.

5- Kürt halkının hayatından kesitler sunan halk oyunları çalışmalarına ağırlık vermek.

6-Köylerimize, mezralarımıza kadar

gidip şiir, ağıt, ninni, hiciv, atasözleri, şarkılarımızı derleyip toparlayıp genele aktarmak.

Genel anlamda hedeflerimizi açıkladıktan sonra çok büyük amaçlarla ortaya çıkmadığımızı belirtmek istiyoruz. Verilmekte olan özgürlük mücadelesinin yanında olduğumuzu açıklarken yapacağımız çalışmaların özgürlük mücadelesine yapacağı en küçük katkınının bizi son derece mutlu edeceğini belirtmek istiyoruz.

Halk Kültür Derneğinin halk oyunları (Folklor Birimi) birimi olarak programımıza aldığımız çalışmalar şunlardır. Diyarbakır halk oyunlarının kursları bitmiş, sırayla Urfa, Adıyaman, Bitlis, Tunceli, Ağrı, Bingöl, Hakkari yörelerimizin halk oyunlarının kurslarının verilmesine başlanmıştır.

Çalışmalarımızda bize bilgi, belge emek anlamında yardımcı olmak isteyen herkesi derneğimizle ilişki kurmaya çağırıyoruz.

H.K.D. FOLKLOR BİRİMİ

Maviye kanat çırpan

bir kuş

Yüregimde sızının

Gece karanlık,

karanlık güçlü

Tutki ellerimden

güneşler doğsun

Muharrem ÇAKAR

JI NAV EDEBIYATA CIHANÊ TOLSTOY

F. Şêxani

Tolstoy, her çiqas di nava edebiyata Rusî de, we re ji, di nav edebiyata klasikiya cihanê de xwediyê ciheki gelek mezin e.

Kont lev Nikolayeviç Tolstoy, di sala 1828 da li eyaleta Tulayê, Yasnoya Polonya yê hatê dinê. Berî li malê hinkeriya xîsusi (beryekî) hûda, paşê li Universita Kazanê de hinkeriya (eğitim) "Hukuk û Zîmanên Şerqê" dit. Dînava van salan da Tolstoy meraqa ajotina jîyanêke bi kêfxweşî kir, dev ji univesîtê berda û di nav refên yekitiya topçiyên da kete herba Qırımê. Ev serboriyên di dû herbê, bi navê "Serboriyên Sivas-Topol" de nivîsibû, rêçên wan rojan tîne berçav. Paşê derket derveyê welat jî bo telim û elmandin. Gelek welatên Ewropa da Lekolinên din ji çêkir. Wexta vegeriya welêt, di çiftlîga xwe ya bê serî û bê bîni da, jî bo xwendina zarokên gundiyan mektebêki (dîbistan) çêkir. Di sala 1862'an de bi Behrê re zewîçî. Ji vîr şûnda ew 15 salên ku borin, jî bo Tolstoy salên pîr xweş û bextiyar bûn. Di wan sala da hem avêtin û rakirina erd û zeviyê xwe pêk ani, hem ji kar û barê dîbistana xwe dûrîşand. Ew, Romana xwe ya "Şer û Aşiti (1862-1868)" û "Anna Karenina (1874-1876)" di nav van salan de nivîsî. Ev xweanin bû derbûna guherandina jiyana wi û berhemên wi.

Ji sala 1880'an şûnda; em wi, pîr exlaqperest dibinin.

Wek di berhemê wi yê ewil da ji tê xwuyani, ku wi li dijî derewê civaki şerekê mezin dani bû. Ew, vi şerî di van salan da êdî baştir derdixê pêş û bi zanehi dîparêze. wek ol, dewlet, agah (bilim), huner, liberalizm, sosyalizm, exlaq, talima gel, alikari, aşitixwazi û hin gelek tiştê din da çî durûti dibine hucûm dîke ser, li dijê wi şer dîke.

Teoriyê Tolstoy ne tenê li Rusya yê li cihanê ji gelek ciyan de aligîr ditiye. Lê belê hejmarên ku li dijê wi ne ji ne kêman. Gelek jî malbata wi jî li dijê wi bûne. We re bû ku, "Meclisa Rusiya Qutsî (pîroz)" wi di sala 1891 an da afa-roz kir. Sala 1910 an da ew û keçîka xwe jî malê revin. Lê li Astapovo yê de li İstasyona trenê de jî nîşkava nexweş ket û Tolstoy, jiyana xwe qedand. Tolstoya di bernama xwe da, wan tiştên ku em di hundîrê xwe da nabînin, an jî jî tîrsa naxwazîna bîbînin, wan tiştê meyên ortaxî nîşani me dîde.

Tolstoy jî bo romana xwe ya bi navê "Şer û Aşiti" wîha dibêje: "Ev bernama ne romanek, ew helbestek jî nîne, qronolojiyeki dîroki qet nîne. Şer û Aşiti, ew rewşa ku têda hatiye zîman de, tiştên ku nivîskar xwestiye bine zîman û wan tiştên ku karîbûye aniye zîman e."

ÇIROKEK JI ÇIROKÊN TOLSTOY

Lı gûndeki du bira hebûn. Rojek bı hevra derketın bo gerin, lı dervayı gund lı nav çınûr û aviya. Pışti gelek geriyan yek ji wan westiya, gotın, "em bıçın ber sibera berekê mezin rûnın û bêhna xwe bıdın". Pışti lı ber beri rûnıştın, méyzekırın nıvisekê dı berê da he ye. Rabun da wê nıvisandınê bıxwinın. Ew tıştê nıvsi ev bû: "Yê vi beri bıbine bıla lı gel rohilatê riya xwe rast bıgre û bıçe nav darıstanê. Pışti darıstanê derbas bû wê robarek bıkeve ber riya wi. Bıla bıçe rexê dın ya avê. Dê lı wê de rê hırçekê mezin bıbine, dı gel wi ji du têjikê wi. Bıla her du têjikê wi jê bistine û bı xwe ra bıbe, bıkeve riya ku dıçe ser çiya, lazıme lı pışt xwe ji nezivire heta dıgihe serê çiya. Lı serê çiya xaniki bıbine. Lı wê de rê xweşi ji heye."

Bırayê bıçûk got: "Da bı hev ra bıçın û robarê derbas bıın û hırç bıbinın û bıçın serê çiya bıgihın xweşiyê." Bırayê mezin got: "Em dê heta ciyê hırçê bıçın, belê ji wir pêde pêngaveki nçın. Dıbe em nıvisa lı ser ber, leng bıbinın. Eger leng ji nebe, dıbe em durust nexwendıbın. Eger em durust xwendıbın ji, pışti em bıçın nav darıstanê dıbe lı me bıbe şev û paşê em neşên lê derbasbın. Dıbe ku em têjikê hırçê ji jê nestının, em bıstının ji çawa bela hırçê ji xwe dır bıxın. Eger me bır ji çawa bı ser çiyayê xın, bê rawestan û bê bêhn. Eger em bıgêhın ji, dıbe xweşi lı wir nine. Xweşi hebe ji dıbe ku kêrême neyê, dıbe ku me wê xweşiya diye. "Bırayê bıçık gohê xwe neda van hemû gotına û got: "Ezê tenê bıçım."

Roja paştır, bırayê bıçûk lı ber rohilatê ve çû. Hemû tışt dit. Çı tışt lı ser ber hatıbû nıvisandın, wısa hatın riya wi ji. Têjikê hırçê xêrhatin lê kırın û wi rakırın ser kolan û wi kırın mirê welatê xwe. Şeş sala bû mirê wan. Ev şeş sala bı dılxweşi û keyfi derbas bû. Heta rojeki mirek dın tev bı mırovê xwe ve hat. Ev mira welatê wan talan kır û bû mirê nû. Bı mırıtı lı bırayê bıçûk lexıstın û ji wir derxıstın.

Bırayê bıçûk zıviri cem bırayê xwe yê mezin. Hış da li gundê xwe, her tışt wek berêye. Halê birê wi wek bêreye. Ne lê zêde bûye, ne ji lê kêm bûye. Bırayê mezin got: "Ma mın ji ter ne got be?" Bırayê bıçûk bersıva wi da: "Raste, vé gavê tu tışt dı destê mın da nine. Lê berê ji destê mın da nin bû. Ewe lı ser be nıvsi bû, hemû tışt hat serê mın. Lı serê wi çiyayê û lı wi welatê ez bım mir. Ji wir anwa ve gelek serbori û birhatına mın heye. Vana bo xwe bıkıım feyde. Dê tu, wek mın ê berêye. Ne zengini û ne ji feqir, tu bê serbori û birhatınê ji."

"Vi çiroka han sala 1985'da dı kovara "Dengê me" hejmara 1'an de lı Dıhokê bı tipê érebi hatıbu çapkırın. Ji bo Govende S. Bırıfkanı ji tipê érebi veğerand tipê latini."

Ferhengok

Çınûr	: Bir ot cinsi
Leng	: Eksik, aksak
Siber	: Kaya gölgesi
Serbori	: Macera, serüven
Ber (1)	: Ön cephe, yan
Ber (2)	: Kaya
Birhatın	: Hatırlamak, anı
Berekê mezin	: Büyük bir kaya
Robar	: Nehir, ırmak
Rexê dın	: Öbür taraf
Hırç	: Ayı
Têjik	: Yırtıcı hayvan yavrusu

TENDÛR

F. IŞIK

Dı nav çanda gelê kurd de gelek tışt heye ku bı sedsalane dom dıke. Evana hin ji jı holê ranebûne. Tesira tekniki her dıçe zêde dıbe, zanebûna gelan pêşva ji dıçe, Kurd, disa çanda xwe ya kevn re carna jı xızaniyê, carna ji bı armanca parestinê xwediti dıke. Ev xwedi derketın, bê şık ne ji nezaniye.



Wêneyek ji dema tendûrê de nan tê patın

gewrık, nêzi 24 seet tê arımandın (dinlendir-mek). Pışti vê arımandınê her roj nêzi çar tili hevira axa gewrık lı ser hev tê danin. Ev lı ser hev daninê de, berê binê kûpa tendûrê bı giloli (yuvarlak) derdıkeve ho-lê. Her du aliyê kûpa tendûrê

ji vekiri ye. Lê lı binê wi, jı bo dema agir tê de pêdıkeve hewa bıgre, cihê ki vekiri ya dın ji heye. Pışti kûpa tendûrê bı تمامی çêdıbe, kûp qasê 15 roj lı ber rojê jı bo zıwa be tê sekınandın. Dawiyê ji jı tendûrê re cihê ki xweş dıbinın û dora wi bı kevir û ax xweşik dıseyinın. Seyandın tendûrê zexm ji dıke. Pışti vê seyandinê tendûr dıbe wek lıvinê şerandi (pişmiş tuğla). Pışti agir dı nav tendûrê de pêdıkeve, tendûr êdi jı çêkırına nan re ji amade yê.

Bê şık lı Kurdistanê nan tenê lı tendûran de nayê patın. Jı xeyni tendûran, wek sêl û hwd. Kûreyên ku nan tê de tê patın heye. Lê tendûr patına nan de cihêki giring dıgre. Lê iro welatên pêşveçûyi de hacetên nan patinê ya kevn, bawerım êdi tenê lı muzeyan tê dıtın. Wısa xûyaye ku, bı vi xızaniya gelê me, wê tendûra kurdi zû be zû lı Kurdistanê wê nekeve muzeyan. Wê hin gelek sal dı nav çand û kevnepoşı ya (Gelenek) gelê me de hebe.

Çêkırana tendûrê lı Kurdistanê bı zêdeyi kar û barên jun e. Çêkırına tendûrê wısa ye:

Axa gewrık bı mû yê bızına û ka yê zer xweş tê hevirkırın. Ev hevira axa

EVINA BAXÇÊ GULAN

Eman yarê tu delali
Tu delaliya dilê mîni
Te nadîm bî hemî cihanê
Bejîn zîravî gula mîni

Jî bo te helbestan dîxwînîm
Bî axin û bî nalîmîn
Bawer dîkîm te bîbînîm
Hawar! tu delalî ya mîni

Qulunga çemê Elwendê
Va sed sale lî benda teme
Keremke were govendê
Evîndarê bejna teme

Gula sorî lî Mehabadê
Bîlbîlîm jî bo te dînalîm
Bîndestîya te jana mîn e
Ez nexweşekî bê halîm

Sosîna axa Amedê
Ez dîxwazîm te bêhn bîkîm
Jî berxwedana keçû xortan
Rîzgariya te hêvî dîkîm

Lê yaramîn yara delal
Bejîn zîravê çavreş Xezal
Lî şav zincîran da menal
Wekî bîlbîlan ez fîxan dîkîm

Wên biçîrîn şevên tari
Wên roj hîlên lî vî diyarî
Nîslîn dîbê bî nazdarî
Bawerke, jî te pîr hez dîkîm

Yara mîn tu Kurdîstani
Evîna keç û Xortanî
Keserên nava dilanî
Bo Azadîyê jî te hez dîkîm

Salehê Hesên

DILÊ GIRTÎ

Dîşewîte wek tendûra dadayî
canê mîn,
Dîherîke wek ava geliya
çavê mîn,
Dîpîrîpîte wek masîyê bê av mayî
dilê mîn,
Bê mecal û zare zar.
û ez
Dî zîndanêda zîndanî
Dora mîn teji, bî tenê me ez..
Çavê mîn hişyar,

lê nabîhîzîn guhê mîn..
û dîl
dilê bî xeter û kîr,
dîkelî dîpîngîrî
dînzîrî ser helbesta..
Helbest,
bî dîzî bî sed belayî
yek şeva dîvîn mêvan
lî paşîla evînê
a lî bendê mayî.

Cîwan DILGEŞ

Kürt ve Ermeni Edebi İlişkileri

(1)

Kafkas halkları arasındaki karşılıklı toplumsal, siyasal, ekonomik ve kültürel ilişkiler konusunda yapılan inceleme ve araştırmaların Kürt ve Türk okuyucularına ulaşabilenlerinin sayısı oldukça azdır. Bölgede yaşayan Gürcü, Ermeni, Azerbaycan ve Kürt halklarının kültürel düzeydeki ilişkileri, özellikle edebi ilişkileri konusunda çalışmalarıyla tanınan Kınıyaz İbrahim Mirzoev'in son yıllarda yaptığı inceleme ve araştırmalar, bu tarihi ilişkilere büyük çapta ışık tutmaktadır. Haçador Abovyan Pedagoji Enstitüsünün Azeri dili ve edebiyatı bölümünde çalışan aynı zamanda kürsü başkanı olan Kınıyaz İbrahim Mirzoev, 1988 yılında, Kürt ve bölge Halklarının Edebi İlişkileri ve Sorunları, konusunda doktora yaptı. Bu konuda yazılmış bir çok eseri mevcuttur.

Bu yazı BERGEH Dergisinin 5/1990 sayısından aynen alınmıştır.

Kınıyaz İbrahim Mirzoev

Çok yönlülüğü ve zenginliğiyle dikkatleri çeken Kürt ve Ermeni edebi ilişkilerinin tarihi çok eskilere dayanır. Yüzyıllar boyunca dost olarak yaşamış olan Kürt ve Ermeni halklarının karşılıklı ilgi ve yakınlıkları zamanla kardeşlik duygularına dönüşmüştür. Gelenek ve göreneklerinde, yaşam biçimlerinde, folklorlarında ve zevklerinde yakın ve benzer yönler çoktur.

Ermeni ve Kürt halklarının edebi ilişkilerinin geçmişi ve günümüzdeki zenginliği, kuşkusuz, özel bir incelemeyi gerektirir. Biz bu ilişkilerin bazı yönleri üzerinde duracağız.

Kürt ve Ermeni halklarının sosyal ilişkilerine ait belgeler 5-6. yüzyıllara kadar uzanır. Eski ve Ortaçağ Ermeni edebiyatında Kürtlere yer verildiğini görüyoruz. İki halkın tarihi, sosyal ve ekonomik ilişkilerinin özel yanlarının içeren eserlerde bu konular etraflıca incelenmiştir.

Ermeni tarihinde Kürtler hakkındaki ilk bilgiler, 5. yüzyılda, Movses Xorenasi,

Pavstos Buzand ve Yêxişê Kişi adlarındaki tarihçilere aittir.

Genel olarak Ermeni edebiyatında Kürt konusunun yer alış tarihinin eskilere dayandığını söyleyebiliriz. Kürtlerin yaşamı çok sayıda Ermeni yazar ve bilginin gezi anılarında, tarihi ve etnografik eserlerinde yer almıştır. Kürt ve Ermeni halklarının dostluk ve kardeşliği, Ermenilerin eski tarihi sosyal eserlerinde, bugüne kadar yaşayarak gelmiştir.

İki kardeş halkın edebiyatlarında ve sosyal yaşamlarında bu anlayışı doğrulayan dikkate değer bilgilere raslamaktayız. eski Ermeni tarihçilerinin eserlerinde ve edebi yapıtlarında "Kürd", "Kürdik", "Kurdo" gibi ifadelerle sık sık yer verilmiştir.

Burada bazı tarihi olayların anımsanması, görüşlerimizin doğruluğuna yardım edecektir.

8. yüzyılda Sunik eyaletinin en güçlü emirlerinden biri Kürd İşxan adı ile tanınmış kişidir.

"Kürdgik" adlı İşxan 9. yüzyılda Küçük

Hayk'da (Ermenistan'da) yaşamıştır.

12. yüzyılda Emir Kürd Erzurumi, Gürcü eyaletlerinden birinde önemli bir siyasi konuma gelmiştir. İvané ve Zaxaré Zahariyan'ın dayısıdır. 13. yüzyılda ise Kürd Vacütyan, Ararat'da başkanlık görevini yürütmüştür. Bu gerçeklerden anlaşıldığı gibi, Ermeni ve Kürt halklarının dostluk ve kardeşlik ilişkileri çok eskilere uzanmaktadır.

Bu ilişkiler her iki halkın edebi ve sosyal yaşamların da yansımış ve birçok eserlerde derin izler bırakmıştır.

Büyük Ermeni yazarı Derenik Demirçiyân'ın Ermeni-Kürt müziği ilişkileri, Ermeni-Kürt folklorundaki yakınlıklar ve iki halkın gelenek, görenek ve ekonomik ilişkileri konusunda söyledikleri ilgi çekicidir.

1911 yılında İstanbul'da tarihçi Hakop Şahbazyan'ın (Ermeni-Kürt Tarihi) kitabının yayınlanması iki halkın tarihi dostluğunun ve edebi sosyal ilişkilerinin bilinmesinde önemli rol oynamıştır. Bu kitapta Ermeni ve Kürt halklarının yakınlığı ve dostluğunun yakınlığı ve dostluğunun çok eski tarihi köklere dayandığı açık ve inandırıcı şekilde anılmaktadır.

Ortaçağın büyük Ermeni şairi G. Narekatsi hakkındaki Kürtler arasında ilginç görüşler vardır. Bu büyük Ermeni şair, uzun zamandan beri Kürt halkının büyük saygıyla andığı, sevdiği ve okuduğu sanatkarlardan biri olmuştur.

12. yüzyılın ikinci yarısında Mısır'ın Suriye ve Mezopotamya ile birleşmesi sonunda Sultan Selahaddin'in (1171-1193) önderlik ettiği güçlü bir devlet kurulmuştur. Bu arad söz konusu devlet ile Kilikya (Ermeni Devleti) arasında politik, ekonomik ve sosyal ilişkiler gittikçe artmaya başlamıştır. O dönemlerde Ermeni devletinin katolikosu (Ermenilerin dini önderi)

şair ve sosyal önder Grikor Dağa'nın (1130-1193), Sultan Selahaddin ile mektuplaşmıştır. Grikor Dağa'nın Selahaddin'e yazdığı mektupların birçoğu günümüze kadar gelmiştir. Bu mektuplarda onların saygın yakınlıkları gözlemlenebilmektedir. Bunlar, Kürt-Ermeni ilişkilerinin ilginç sayfaları olarak dikkat çekicidirler.

1187 yılında Selahaddin "Haçlı Seferlerine"ne büyük darbeler vurarak Yerusalem'i (Kudüs) alır. Bu olay Ermeni katolikosu Grikor Doğa'yı çok kötü etkiler. Bu münasebetle "Yerusalem'in kaderi" şiirini yazar. Burada Selahaddin'in savaşçılığın dan ve Yerusalem'i ele geçirmesinden söz edilir. Ermeni şair, şiirinde Selahaddin'in kahramanlığını ve mertliğini yürek dolusu bir sevgi ile dile getirir.

Ortaçağdaki ermeni şair ve yazarların eserlerinde Kürt yaşamının sanatsal anlatımına, Kürt şekillenmesine ve Kürt halk motiflerine geniş yer verilir. Ermeni-Kürt dostluğunun evrelerinden sık sık söz edilir, (Frik, Hovannes Yerkatsi, Hovannas Tıkurtsi, Grikoris Axtamarts, Nerses Moktsi ve diğerleri).

Kürtlüğe ait hususlar Kürt-Ermeni sözlüklerinden, Ermeni alfabesi ile yazılmış beyitlerden, şiirlerinden, ata sözlerinden, masallardan ve ünlü Matenadaran'ın kaynaklarından elde etmek mümkündür.

14. yüzyılın büyük Kürt şairi Faqiyé Teyran, "Şeyh Sen'an" adlı ünlü eserinde, hıristiyan kızını Gürcü olmasına bakmayarak, bazan ermeni kızı gibi sunmaktadır.

Şeyh Sen'an ile ilgili efsanelerde ve eserlerde Gürcü kızı şeklinde anlatılan güzelin Feqiyé Teyran tarafından bazan Ermeni kızı gibi gösterilmesi raslantı değildir. Bizce bu, Kürt şairinin Ermenilerle uzun süre aynı topraklarda (şair Hak-

kari'de doğmuş ve eserini orada yazmıştır) yaşamasına, onlarla yakın dostluk ve kardeşlik ilişkileri içinde olmasına bağlıdır.

Şair, sanki bununla kardeş halka kendi samimiyetini ifade etmek istemiş ve bu duygularını Ermeni kızının kişiliğinde sonsuzlaştırmaya çalışmıştır.

Kürt edebiyatının eski ustası Süleymani Pergamenti'nin (7.yy) Ehmedi Xani (16-17.yy) gibi tanınmış Kürt şairleri Ermeni tiplerine özel bir yer vermişlerdir.

Onların eserlerinde, Ermeni edebiyatının bazı konu ve anlatımlarından yararlandıkları görülür.

16. yüzyılın ünlü Kürt tarihçisi Şeref Xan Bitlisi'nin "Şerefname" adlı eserinde ermeni tarihi, folkloru ve etnografyası konularında ilginç bilgilere rastlamaktayız.

Büyük yazar ve pedagog Mesrop Tağiadyan (1803-1858) eserlerinde Kürt dili, gelenekleri, görenekleri ve tarihi konularında bu halktan saygıyla söz etmektedir. "Ermenistn Seyahatı", "Iran Seyahatı", "Versenikin Vasfı" eserleri Ermeni-Kürt edebi, sosyal ve tarihi ilişkileri bakımından değerlidir.

Ermeni-Kürt edebi ilişkilerinin gelişmesinde büyük yazar ve eğitimci Xaçatûr Abovyan'ın (1809-1848) emekleri büyüktür.

Ta küçük yaşta Kürtlerin yaşamına yakın ilgi duyan X. Abovyan, bu konuda şunları yazmaktadır: "...Kürtlerin arasında uzun süre kaldım. erkeklere kadınlara hediyeler sundum, onların güvenlerini kazandım." Kürtlerin gelenek ve görenekleri, karakterleri, inançları ve hatta destanları konusunda değerli bilgilerin hepsi sonraları Abovyan'ın eserlerinde gerçek ifadelerini bulmuştur. Bunlar arasında "Kürdler" "Yezidiler" eserlerinde Abovyan, Kürt halkının yaşamına,

etnografyasına, edebiyatına ve diline geniş yer vermiş ve komşu halkın ruh yapısını anlatmaya çalışmıştır.

X. Abovyan eserlerinde Kürt folklorunu yüceltmesi çok anlamlıdır. Onun şu belirlemesi oldukça ilginçtir: "Kürt halk destanı ilginç bir gelişme sürecinden geçmiştir. İster kadın, ister erkek bütün Kürtler doğuştan şairdirler. Onlarda doğal ilham ve şiire tutku var."

Kardeş halkın büyük edebinin, Kürtlerin yaşam biçimine duyduğu yakın ilgi Kürtler tarafından cevapsız kalmamıştır. Kürt araştırmacıları Abovyan'ın bu sevgisini değerlendirerek bu konuda eserler vermişlerdir. X. Abovyan birçok kürt mani ve diğer folklor türü örneklerini toplamış ve yayınlamıştır.

Tanınmış ermeni roman ustaları P.Proşyan (1837-1907) ve Raffinin de (1835-1888) eserlerinde Kürt konusuna değinmişlerdir. P. Proşyan'ın "Huno" romanında "Haso" ile "Kuro", Raffinin "Celaleddin" eserinde "Ömer Ağa" ile "Mısto", "Xent" romanında "Çavo", "Kıgılcım" romanında "Mir Mösüm" gibi Kürt tipleri vardır.

Kürt yaşamının bazı üstün özellikleri tanınmış ermeni Yazar V. Papazyan'ın (1864-1920) eserlerinde karşımıza çıkar. Daha çocukluğundan beri Rus, Fars, Azerbaycan ve Kürt halklarının tarihlerini ve medeniyetlerini öğrenmeye başlamıştır. Bundan ötürü de Papazyan ermeni-Kürt dostluğuna kendi eserlerinde çok geniş yer vermiştir.

"Abağa Vadisinde", "Çeleb", "Lûr-de-Lûr" (Kürt halk melodisinin adıdır), "İlk sevgi" gibi eserleri okuyunca yazarın Kürt yaşamına, inceliklerine değin derin bilgileri ve bu yaşamı ne denli severek kaleme aldığı açıkça görülür.

(Sürecek)

ÇIROKA ZEMBILFROŞ

Mehmet EKMEŊ

Dibe ku beri İslamiyetê de û dibe kû wexta serê İslamiyetê de;

Hukumdarek lı şerqa me hebûye, hukumdarek adil û baş bû. Yek ewladê wi hebûye. Bı naz û delali mezın bûye, xorteki gelek rınd û delal bûye, jiyana wi bı zewq û sefayê dı nêçir û gerê da derbas bûye. Bı vi awayi ji zewiciye û zarokên wi çebûne.

Rojeki disa bı wezirê bavê xwe ra lı neçirê dıgeriya. Lı kêleka rê rastê mezeleki (turbeki) xerabe tên. Têda serê mırî derketiye derve. Çıqas nihêriye tıştek fehm nekiriye, jı ber kû jiyana wi dı zewq û sefayê de çûye, nexweşi û elem nediye, mırın ne bihistiye û lı vê hali maye heyri. Gazi wezir kiriye û gotiye, "ey! wezir, ev çiye çı hale bibêje jı mın ra!"

Wezir dibê, "sultanê mın, delalê mın ev serê yekê mırîye, derketiye derva, ser axê."

Prens dibê "mırın çı ye?"

Wezir dibê "mırın; paşiya jiyana insana ye. Jı vê dinyayê derbasê دنیا wê ali dibe, can dıde, mırov dıbın axe de vedışêrın. Her kû dem û wext lı sera derbas dibe, mırov dibe ax û xeli. Hestiyê wi ji bı vê awayi dimine. Hesti ji goşt derengtir dibe xweli. Ev hestiyê qafê serê mıroveke ye."

Prens dibê; "çıma mır, Nexweş bû, faqır bû, maldar û navdar bû, çı bû?"

Wezir dibê; "ev aqûbeta her mırovê ye. Mırın lı dewlemendi û feqiriye nanêre."

Prens dibê; "wek tû dibêji, mıha ezê ji bımırın û bıkevımê ve hali?"

Wezir dibê; "belê sultanê mın, wê ez ji, bavê teji û tû ji, wexta roja me hat, emê tev bımırın û bıkevıne vê hali."

Prens lı serê mırî nihêri û gelek fikiri. Berê xwe da vezir got: "Were em vegerine malê." Prens çû mala xwe, bı rojan kûr û dur fikiri paşê jı jına xwe ra got; "mın dev jı prensbûnê, sultaniyê û vi tamamê saltanata xwe berda. Jı vir şûnda ezê dı riya xwedê da bıxebıtım."

Jına wi bersiv dıde û dibê; "ew rêya kû te xwe avetiye, dı wi rê da ez ji bı terame." Dı du van qısedana ra prens dev jı mal û jı mülkê xwe berdıde, lı malê helal dıgere. Helali ewe kû mırov bı keda xwe bıji.

Ew dest bı çêkırına zembilân dıke. Zembilê xwe çêdıke û welat welat dıgerine, dıfroşe û pê jiyana xwe berdevam dıke. Bıvi awayi têne Farqinê. Lı wır jı xwe ra koxeki ava dıke û tê da Zembila çêdıke û dıgerine. Ew çax der û dora Farqinê tev sûrkiri bûye. (ıro ji dewsa wan sura xuya ye)

Cılê Zembilfiroş kevn û qetiyayi bûne, lı dı hundirê wi kırasê peritida xortekê zırav û bılınd, çavrêş û bel

buye, Zembilfroş. Rojek zembilê xwe dîgêrine, tê binê bircêki. Lê serê burcê mala mir bû. Xatuna mir lî serê bircê dî pacê da zembilfroş dibine, bî dilêk na, bî heft dîla wi dî hebine û deng lê dîke û dibê;

XATÛN:Zembilfroş zembila tine,
Dîkkan bî dîkan dî gêrine
Hiş lî Xatunê namine
Seri zaman dî gerine
Gazi dîkê ku bibine.

ZEMBILFROŞ: Xatunê ez tobedar ım
Delalê ez tobedar ım
Zarok birçine lî malın
Jî rebbê jori nîkarım.

XATÛN : Zembilfroş lawkê abbas e
Bî tena derpê û nenas e
Çî xortêki xweş û kıras e
Keremke oda xas e.

ZEMBILFROŞ:Xatune ez tobedar ım,
Delalê ez tobedar ım,
Zarok birçine lî malın.
Jî rebbê jori nîkarım.

XATÛN: Zembilfroş lawkê derwêş e
Keremke were pêş e
Dilê meyê gês ne êş e
Bîhayê zembilê xwe bêj e

ZEMBILFROŞ :Xatunê ev der farqin e
Tu halê mın bî bibi ne
Zarok lî mal birçin e.
Hêviya rebbê jorin e
Xatûn ê ne teşqilin e
Hurmeti ne teşqilin e
Zembil bıçuk çerxin e
Ê mezin du mecidine.
Xatunê ez tobedar ım
Delale ez tobedar ım
Zarok birçine lî mal ın
Jî rebbê jori nîkar ım.

XATÛN : Zembilfroş lewîkê feqir e

Were ser doşeka mir e,
Bıdime te zulfê harir e
Lî te helal herama mir e

ZEMBILFROŞ: Xatunê ez tobedar ım,
Delalê ez tobedar ım,
Zarok birçine lî malın,
Jî rebbê jori nîkarım.

XATÛN: Zembilfroş lawêki wezir e
Keremke oda mir e
Bî xwe teame pê re
Weke begler û şêr e.

ZEMBILFROŞ: Xatune ez tobedar ım,
Delalê ez tobedar ım,
Zarok birçine lî malın
Jî rebbê jori nîkarım.

XATÛN: Zembilfroş lawki musulman e,
Dilê wi xweş bî iman e,
Memkê mın wek sêvan e
Dıranê mın mercan e,
Çavê mın ê xızalan e,
Singamın wek zozana ne,
Bırhemın wek qeytan e
Bejnamın wek rihan e
Çıqa bêji hêjan e

ZEMBILFROŞ: Xatune ez tobedar ım
Delalê ez tobedar ım
Zarok birçine lî malın
Jî rebbê jori nîkarım.

Dî du van gotina re, xatun bî hawa ki Zembilfroş dîkîşine jor û dewa hezkırine lê dîke. Zembilfroş dîke, nake xwe jî deste xatunê xılas nake. Xatûn dibê, "Zembilfroş, ger tû neyê ser nıvına mın ezê bıkım qêr û gazi, bibêjim, Zembilfroş hıcum ani ser mın dıxwaze dest bawejê namusa mın." Zembilfroş jî tırsa rezilbuna alemê dibê, " bira be lê belê ez pır qrej bume, ka tu mısade ke ez hınek xwe bışom, paqj bıkım." Xatûn mısınê avê dîdê, lê pê qenyet nake serê weris bî

nîge Zembilfroş ve girê dîde û dîşîné bane koşkê. Lî gora ku tê gotin bîlîndîya koşkê qasî 20 mitro ye, hînek dîbên hin bîlîndîre.

Zembilfroş lî diyari koşkê de lî jêr dînhêre pîr bîlînde, lê belê çare tune, wî xwe jorda bavêje, çavê xwe dîgire duakî dîxwîne û xwe jorda berdîde. xwarê. Wek tê gotin tîştekek pê nayê û radîbe bî sîlametî xwe davê je koxa xwe.

Pîştî qederkî Xatûn dîsekîne, lê deng jî Zembilfroş nayê. Serê werîsê xwe dîgire dîkîşîne lî werîs vala dîkîşe Radîbe dîçe serê koşkê bala xwe dîdê kesekî tuneye. Xatûn dîfîkîre rêya ku tê ra peya be tuneye. Fem dîke ku wî xwe jorda avêtiye. Xatûn, daw û dîkêlê xwe lî hev dîgerîne û dîkeve nava bajêr, kuçe bî kuçe dîgere, dîpîrse dawîyê de mala Zembilfroş dîbine. Lê ew çax Zembilfroş ne lî male, jîn û zarê wî zîk bîrçî, pîştî tazi û dî rewşeke xîrab da ne.

Xatûn jîna Zembilfroş ra dîbê, "hermet bîra wan kîncê lî ser mûn tevî xîr û emaret, zêr û zîvê serê mûn tev jî te ra bîn û tu kîncê xwe yê lî ser te perîtîne bîde mûn, ya duduya îşew bîhêle lî nav nîvînatê razê." Pîreka Zembilfroş jî bê mecâlî van gotîné Xatunê qebul dîke.

Zembilfroş nivê şevê bî hale kî westîya tê mal, ku zarûk razane. Ew jî dîkeve nava cîhê xwe. Dîxwaze hînek bî jîna xwe şabe. Lê Xatûn wexta kînce xwe bî jîna zembilfroş ra guherandî bû, xîrxalê nîge xwe jî bîr kîriye. Gava nîgê Zembilfroş lî xîrxalê nîgê Xatunê dîkeve, jî rewş fêm dîke û radîbe jî nav nîvînê xwe derdîkeve berê xwe dîde

çolê û dîçe. Lê Xatun dîdê pê, gelek dewr û zeman lî pey hew bî çolê da dîçîn. Paşê Zembilfroş jî Zerdestê Kal mîrîna xwe dîxwaze û dere ser heqîya xwe. Lê Xatûn lî ber serê wî rûdîne dîgîrî û ew jî lî wîr mîrîna xwe dîxwaze. Wer tê gotin ku Xatûn jî lî ber serê Zembilfroş can dîde. Dîbejîn ew der Zerweterk e. 5 km. lî serqa Sîlîva, lî rûberê Zerbiyan e. Zerbiyan (Sögüt) hin jî wek ziyarete.

Qela Zembilfroş îro jî lî Şîmalê Sîlîvaye. Têvê cîhê xwe va qalekî zêdetîrê 20 mitro bîlînde. Lê pîr mûxabîn ku jî bêxwedîtiyê xerabe bûye.

Mîletê kurd, mîleteke bî bawerîye; sîlsîla xwe wîha dîbêjîn; Rustem kurê Zal e, Zal kurê Qal, Qal kurê Dal, Dal kurê Sebilqîran, Sebilqîran kurê Serhesîn e.

Lê dîbêjîn, berîya Îslamîyetê jî, dî pêy wî ra jî kurdan xwedan îman bune, bî xwedayê jêr û jor va bawerî bune. Lê vî halê wan her tîm wan bî hînek xwînmîjan daye xapandî.

Sellaheddîné Eyubî, jî tîfaqa Îslamîyetî ra xîzmet kîriye û hatiye xapandî.

Xelqê Şerqê dî herba Mîlazgîrê da lî dîjî "zîlmê" alîkarîya Alpaslan kîriye, paşê dîsa hatîne xapandî.

Dî herba Çaldîranê da, alîyê Yavuz serkîrîne û paşê hatîne xapandî.

Bedî-u Zeman, xîzmetekî mezîn jî îslamîyetî ra kîriye, paşê hatiye xapandî û bî tevî cesedê xwe va wînda buye.

Dî serê mesnevî ya Celaleddîné Rûmî da wîha tîştekek nîvîsandiye; "emsey tû kurduyen ez beyt û Ara-

biyen." Kurdiya wi: "Ez kurdım, razam
û rabûm bûm ereb"

Katibé Mevlana Şah Husametîn
Kurd bû û hate xapandin.

Şêx Ahmedê Xani sêsed û tıştık sal
ewıl hebuye û wê demê Mem û Zin
efirandiyê. Shakespeare ji 170-180 sal
ewıl kitaba eşqa Romeo Juliet çêkiriye
û bı vi ji tê zanin, Shakespare, kitaba
eşqa Romeo Juliet jı Mem û Zin
şibehandiyê û ilham jı Şêx Ehmedê
Xani stendiyê.

Şêx Ehmedê Cıziri 4-5 sed sal berê
Diwanêk dı behra eşqa tasawufi da
efirandiyê. İro ji kes negıştiye kemala
wi.

Melayê Batê 4 sed sal berê Mewlut
çêkiriye. Dı vê Mewluda xwe da ilma fe-
lekıyat, astronomi, kainat û nura
Resulê Ekrem daye nişandan. İro ji kes
nikarı mana wi bine ber çav û ewqas
xweş bêje.

Zembilfroş ji yek jıwan aşqa kur-
daye û baveriya me ye. Selam jı we ra!

BO ZANİN

1- Yekemin rojnama Kurdi "Kurdistan" bû. Lı 22' yê Nisanê 1898' an da lı Qahirê derke-
tiye. Xwedi û Sernivisarê wi Miqdad Mihtat Bedirxan beg bû.

2- Yekemin kovara Kurdi "Roja Kurd" (Rojkurd) bû. Sala 1913' an da lı kovara bı ali
Komela "Hêvi lı Stenbolê derdiket.

3- Yekemin şanoya Kurd, "Memê Alan" e. Rehim Rehimê Hekari sala 1917' an da lı ko-
vara "Jin", ku lı Stenbolê derdikete belav kiriye.

4- Yekemin çiroknivîsê Kurd, Fûadê Temoye. Lı 1913' an da çirokek xwe lı kovara
Roja Kurd da belav kır.

5- Yekemin Romannivîsê Kurd Erebe Şemo Şamilov e. (1897-1978)

6- Yekemin rêberê hozana Kurdi ya serbest Qedrican e. (1916-1972)

7- Yekemin rêberê netewa milletê Kurd, rexnegir û destana hozani Ehmedê Xani ye.
(1652-1707)

8- Yekemin Ferhanga Kurdi "Nubar" e. Bı ali Hozanvan û Feylesof Ehmedê Xani va ha-
tiye nivisandin. (1652-1707)

9- Yekemin diroknivîsê Kurd, Şerefhanê Bedlisi ye, xwediyê pirtuka "Şerefname" ye.
(1543-1598-1599)

10- Yekemin xwendîngeha hozana Kurdi ya klasiki, xwendîngeha Cıziriye.

11- Yekemin şoreşa Kurdi ya welatperweri, şoreşa Bedirxan paşayê Mirê Cızira Botan
e. (1843-1847)

12- Yekemin rojnama Kurdi ku lı Yekitiya Sovyeti derketiye, rojnama "Riya Teze" ye.
Lı sala 1930'an da lı Yêrivanê derketiye.

13- Yekemin rêzmannivîsê Kurd, Eli Teremaxi ye. Lı sala 1591-1592' an da pirtûka xwe
ya "Destura zmanê Erebi bı Kurdi" nivisand.

Ji Kovara "Dengê Me", Hejmar 1 û 2, 1985, Dîhok.

Werger; ji tipên Erebi bo tipên Latini, S. Birifkani.

T I Ş T O N E K **BERHEVKAR:**
Kezal Sasuni

- *Kûrê kerê
 Ser bênderê
 Kayê dıxo nade kerê (Bersiv: Mirovê tıma)
- *Ser lı hundır
 Bın lı derve (Bersiv: Bızmar)
- *Ser mazi lı kaş û kendala dı bezi
 Dıke hewar û gazi (Bersiv: Kew)
- * Kûr jı bavê bılıntır (Bersiv: Ker û Hestır)
- * Gaê zexel lı paş malê meğel (Bersiv: Kundır)
- * Dı qûlekide keriki pez (Bersiv: Mûrik-Karınca)
- * Jı jehrê taltır
 Jı şekırê xweştır
 Jı sêvê piçûktır
 Jı devê gırtır (Bersiv: Gûz - Ceviz)
- * Çêlek lı hundır dizê golık ser banê dileyze (Bersiv: Sobe û dû)
- * Du marê reş du gulê geş (Bersiv: Çav û bırı)
- * Bûk lı hundır û porê wi lı derva (Bersiv: Lazût-Mısır)
- * Totıkê çar çembıl (Bersiv: Kûsi)
- * Tasek mast lı meydanek rast (Bersiv: Hiv)
- * Dıçım newalê tê qijina marê (Bersiv: Av)
- * Bın erdê çêdibe zilawi lı dervaye (Bersiv: Kartol)
- * Çûm û çûm du rêz mırari
 Çûm û çûm du qûlê geş e
 Çûm û çûm du çıraê geş e
 Çûm û çûm dahleki reş e (Bersiv: Dran, Poz, Çav, Por)
- * Qesra spi bê deri (Bersiv: Hêk)
- * Kûmê hutık tji nûtık (Bersiv: Hêjir)
- * Sıma hêstirê si û sê heb têda dıstirê (Bersiv: Hınar)
- * Du rêsi gıya lı pişt çıya (Bersiv: Kezzê por)

JI BO ZAROKAN

KER Û ROVI

Roviyek hebû, mîsêwa (her dem) dîçû şînrê (benîkê çerm) cotvaniya ji wan dîdîzi û dîxwar. Ne rojek, ne dudu, ne sîsê... Rebena ji, wê her roj ji nûve çêkî û wê rovi ji bîxwe... Paşê cotyar hatin ba hev û ji hevra gotin:

-Emê çî bîkî ji ber destê vi rovi? Wê şevêk we re şînira bîxwe û heta êvari me betal bî hêle, em nîkarî ji ber wi cot ji bîkî.

Bî hevra wîsa xeber dîdan, kerê cotyara ji lî wan gûhdari dîkîr. Ji nav keran yêki pîr derket û got:

-Heyra, xwestînekê mîn heyê, hûn xwestîna mîn binî cîh, ezê ji heqê rovi derkevîm.

Cotyar lî hev meyzandî û ji kerê ra gotin:

-Ka bêje, xwestîna te çi ye kero?

-Hûn heyê ez bîmîrîm bî ceh û kayê mîn xwedî kî, bese.


-Bîrabe, bî ser çawa emê te xwedî kî.

Kerê pîr ji got:

-Ezê wi roviyî werînim ber destê we û hûn ji heyfa xwe lî gor dîlê xwe jê hîlînin.

Kerê gewr rabu çî heta devê qula rovi, xwe dîrej kîr, devê xwe vekîr û dîra nê xwe çîç kîr, jî bo rovi wi bîbine û bêje mîriye.

Rovi jî qûla xwe derket, mêze kîr ku wa kerek dî devê qulê de mîriye. Vegeriya qulê û jîna xwe re got:



-Sebê mîn xewnek dîtiye.

Sebê dîbê je:

-Xêr be rovi, çî xewne?

-Welle mîn dît ku kerek hatiye devê qulê û cehemiye, tê bê ne isale eva heft sale mîriye. Rabe Sebê em herîn mêze kî.

Ew û jîn bî hev ra derdîkevîn mêze dîkî ku bîra wîsa ye. Sebê dîbê:

-Weyla şêxê kurê şêxa, zanayê kurê zana, xewna ku te dîtiye raste.

Rovi dîbê:

-Rabe em vi bîkîşînin nava qulê.

Rovi radîhêje terya kerê xwe dîkîşkîşîne nabe, lîngê wi dîkîşîne nabe, serê wi dîkîşîne nabe, xwe dîdê ber laşê wi nîkarê qet bîqelîbîne. Rovi ji Sebê ra dîbê:

-Sebê ka bêje em çawa bîbîn hundîrê qulê.

-Ma rovi kar ne planê tene, tu planciyê

wek te heyê. Zanayi tev lî ba tene.

Rovi jî jîna xwe re got:

-Raste, ka ew benê şîmîra, ku me jî nîra hîlkîriye teva bine.

Sebê dîçe tîne. Rovi radîhêje şîmîra pêşiyê bî xwe ve girêdîde, pêy ra dibe bî nava kerê ve girêdîde, jînik jî arîkari dikê û bî hevra dîkşînin.

Rovi xwe hîneki dîkşîne, hê wîlo ye ker jî nîşkave radîbe ser xwe dîziqe û dîreve. Serê rowî lî kevîr û dara dî keve û dîbake (gazî dikê):

-Hawar Sebê!...

Sebê jî pêyva bazdîde û bî girîn lê mêyze dîke. Ker mêrê Sebê bîr nav cotyara, rebenê jî bê telesi ma, vejeriyâ qula xwe.

Ker rovi bîr nav cotyara û cotyar jî ne dudu ne, ne sîsê. Cotyar jî pêşî qenc lî rovi dîxîn, dilê xwe lê rîhet dîkîn û paşê wî dîgurîn û berdîdîn.

Kerê pîr jî jîyana xwe ya mayîn lî ser afîrê tîjî ka û ceh da dîborîne.

**Berhevkar : Xelîl TEMO
BATMAN**

MAR Û MIROV

Mîrovek bî rê ve dîçû, rasti marekî tê. Mar ketîbû bîn kevîreki mezîn, ne dîkarî bû derkeve, ne jî bîlîve. Dilê mîrov pêve ma. Xwe da ber kevîrî, kevîr rakîr û ew xelas kîr.

Mar xwe dawêşand, ser zîkê xwe rabû û dîrêjî wî kîr. Dîxwest bî wî veda. Mîrov got:

-Maro, heyran, ma çawan dibe, mîn tu jî mîrînê xelas kîrî, tu dîxwazî mîn bîkûjî.

-Mari got:

-Ma jî mêj ve em ne dîjmnê hev in, ezê bî te vedîm.

Mîrov kîr ne kîr, mar jê nedîgeriya.

Paşî, gote wî:

Qet mebit em herî jî eqîlmendekî bîpîrsîn.

Mar qail bû û dan rê. Gavekî çûn rasti rovîkî hatîn. Mesela xwe jê re gotîn. Rovi lî mîrovî fedkîrî û kenî. Pîşt re gote wan:

-Dîvê cîh bîbînim ku bîkarîm qerera xwe bîdîm.

Şûn da vejeriyân û hatîn ber kevîrî. Rovi jî mîrov re got:

-Tu kevîrî rake.

Ewî kevîr rakîr. Rovi jî mar rê got:

-Tu jî bîkeve bîn.

Mar kete bîn û mîrov kevîr berda ser.

Qederekî man, rovi deng nedîkîr. Mari got:

-Rovîya kenî qerera te çîye, ez dî bîn kevîr deqelxîm.

Mîrov dil dîkîr ku here. Rovi xwe lî wî gîrt û got:

-Careke dîn, vî kevîrî jî cîhê wî rameke.

Çîrok bêj, 8 Tebax 1932
Jî kovara Hawarê, Hejmar 6
Amedekar: Xefûr BIŞÊRÎ

X A Ç E R Ê Z

ÇEPERAST

1- Cihan, dinya... Dı zmanê kurdi da navê daçekek. 2-Din, diyanet... Derd, kul. 3- Ew hacetê ku davêjine ser stoyê ga... Arvan. 4- Beyreq, nişaneya nasina netewan... Xebat, şixwîl, emel.. 5- Ew tışt yan buyera ku behsa wê tê kırın... sax, tensaz, serefraz... 6- Baş... Ew bêjeya ku bı xwe ne nave, lê dı hevokêde ciyê nava digre, serenav... 7- Beg, unveni berêzi girtinê... Cejn...

SEREJER

1-Pêşnavê wi Evdîlaye. Wêjevanek here giringê Kurdistanana rojhulat e. Dı helbestvaniya kurdi da rêçek nu, terhek hûjen daniye. 2-eşır, qefle... Bervaci mane ya beyreqê didê.

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

3- Nerin... 4-tewanga lêkera dızın ya dema bori... keşê yekaniya sêwın. 5-... 6- Mınasıb. 7- Nişana ser rûyan. 8-Serçavi... 9-Dı zmanê Kurdi da cinavek... Serbest. 10- Ava ku çıl têda têne şuştın, ava carikrina cılan...

PÊKENİ

PÊKENİ

PÊKENİ

ÇI XWEŞ DIKENE

Careki mıroveki kûlavê xwe bı deyn daye cınarê xwe yê şıvan. Dı navberê sal û meh derbas dıbin, zıvıstan tê, lazımiya wi jı kûlav ra çêdibe û kûlavê ku bı deyn daye şıvan dıkeve bira wi.

Rojeki jı bo kûlav lı derê şıvanê cıran dıxe. Jına şıvan dertê der, dıbê:

-Bırango keremke jorê.

Mévan dıbê:

-Xwişkamin xwedê jorê ava bıke lê belê şıxûleki mın bı mêrê te re hebû.

Jına şıvan dıbê:

- Şıxûlê xwe jı mın ra bêje mêrê mın ne lı male.

Mevan dıbê:

- Mın çend sal berê kûlaveki bı deyn dabû mêrê te anwa dıxazım.

Jına şıvan bersıv dıde û dıbêje:

- Başê, serçava, sebırke bira bahar bê, çiya û bani hêşın bıbe, mêrê mın şıvane, bira pez û berx xûrt bıbin û kereng zer bıbin, payizê pezê mexel dı nava kerenga re derbas bıbin û hırıyâ pez bıserê, dırıkê kerenga wê hırıyê bıgre, emê wi hırıyê tovbıkın bıdıne lıbûci ewê kûlavê te çêbıke û emê kûlavê te bıdın.

Mérık jı hêrsan dıkenê û jı xwe dıçe. Jına şıvan dıbêje:

-Bıra ê mın zane kû heqê wi pêşine, çı xweş dıkene.

M. ZERO

Jı Xwendavanan

Govend'li Arkadaşlara;

(...)

Govendi içerik ve biçim açısından gelişkin ve zengin buldum. Amed de böyle bir yayının çıkarılabilmesi, ülkemizin sanat, kültür ve edebiyat birikimine önemli boyutlarda katkılar sağlayacaktır, buna inanıyorum. Bu gün dünyadaki son gelişim ve değişmeler bir ulusun, bir halkın özgürlük mücadelesinde kültür ve sanat cephesinin ne kadar büyük boyutlarda öneme sahip olduğunu göstermektedir.

Kültür ve sanat bir ulusun, bir halkın nabzıdır, uygarlık ve ilerlemesinin bir ölçümsel göstergesidir. Kültürel ve sanatsal değerleri güçlü olan uluslar ve halklar, insanlığın evrensel ortak değerlerine her zaman daha güçlü katkılar yapmış ve derin birikimlerin oluşmasında önemli işlevler görmüşlerdir.

Sanat ve kültür cephesi cılız olan veya yadsınan bir özgürlük ve kurtuluş mücadelesinin başarıya böylesi eksikliklerle varabilmesi her zaman çok zor olmuştur, varılmış olsa bile, o halkların yeniden inşa ve onarım süreci bu alanda büyük yetmezlikler ve kompleksler yaşamış, bir çok şeyde, hep sil baştan olmuş, bir çok dönüş ve gerilemeler görülmüştür.

Bu gün; ülkemiz ve halkımız açısından yarımın her boyutta inşasıdır yaşanan...

Halkımızın çok zengin bir tarih, kültür ve sanat birikiminin olması, ülkemiz sanat ve kültür temsilcilerine büyük olanaklar sunmaktadır. Ve tabiki büyük boyutlarda dezavantajlarımız da vardır (...)

Çalışmalarımızda başarılar diler dostluk dileklerimi sunarım.

Salih ÖZÇELİK

**Gaziantep özel Tip Cezaevi
E-3 Blok**

Merhaba Dostlar;

Bizler, Malatya E Tipi Cezaevi 10. Koğuşta kalan Devrimci tutsaklarız. Yazılı basını, sosyalist dergileri olduğu gibi devrimci kültürel yayınları da, isim ve adreslerine ulaşabildiğimiz oranda abone olarak izlemeye çalışıyoruz.

Yayın yaşamına yeni başlayan derginize ve çalışanlarınıza "Hoşgeldiniz" diyor ve kardeş selamlarımızı iletiyoruz.(...)

Devrimci Selamlar...

Serdar DEMİREL

**Malatya E Tipi Cezaevi
PK. 183 10. Koğuş**

Govend Dergisine Hitam...

Göndermiş olduğunuz Dergiyi aldım. Göstermiş olduğunuz ilgiye canı gönülden teşekkür ediyorum, bundan sonraki yayımlarınızda da aynı başarılarınızın devamını bütün kalbimle temenni ediyorum. (...)

Ortak olmanın mutluluğuna ulaştırdığım içinde gururluyum ve de gurur duyuyorum.

"Her şey bizler için olmalı, biz onlar için değil."

Sevgilerle...

Rahim ŞİMŞEK

**Kapalı Cezaevi
Akhisar/ MANİSA**

Bı Navê Yezdan;

Gelek selamên germ bı dilek tji, bı evina welat, jı we, hevalên hêjare dîşinim. Xebata we ya jı bo binketina kotekiyê û zilmê we piroz dikim. Hêvi dikim dî demên bê de û dî rojên nêzik de em hemî gelê Kurd û gelên hem xakê me birati, wekhevi dî nava xwe de çêbikin.

(...) Daxwaza min xweşî û şadi û dilrehetiya we û hemî gelê Kurd e.

Cudi CİZİRİ / Stenbol

Değerli okuyucularımızdan bir çok mektup aldık. Üzülerek belirtelim ki mektupların büyük çoğunluğu Türkçe yazılmıştı. Tabiki mektuplarınıza yer vermeme mizin nedeni Türkçe yazılmaları değildi. Yer darlığı nedeniyle yer veremedik.


KEK H. SAİT ÇÛ HEQİYA XWE

Bawer DILAN

Bajara Diyarbekır ji aliye welatparezi û sosyalizmê da lı Kurdistanê ciyek giring dıgre. Her wısa qezeyê Diyarbekır Lıce ji, ji aliye welatparezi da lı Kurdistanê ciyek giring dıgre.

Kek H. Sait lı Lıcê dı sala 1943'an da hatiye dınê. Ew lawê maleki welatparêz bû. Ew, yek lawê malê bû. Wek pıraniya xortên Kurdistanê, Kek H. Sait ji pişte ku dıbıstana yekemin xılas kır ket nava şerê jıyanê. Lı ser qamyonan xebiti û bu şofêr.

Kek H. Sait lı bajaro-ka Lıcê bı nav û deng bû; Jı ber ku ew ji xortaniya xwe heyani mırına xwe dı nav şerê gele me da cih dıgırt. Heta 1975'an dı nav tekoşına gele me de wek welatparêzeki hêja tekoşına xwe ajot. 1975' an da dema kovara Riya Azadi



derket û xebatên Riya Azadi bı xûrti dest pê kır; ew ji dı nav wan xebatan de cih gırt, bû hevalek jir û hêja.

Dema ku 12 İlonê de cuntayê faşist hate seri, Kek H. Sait ji bı rûmeti û bı camêri dı nav tekoşinê de, dı nav refên Riya Azadiyê de çı jı destê wi hat ani cih û qaveki bıçûk ji paşve nevê; roj bı roj peşve dıçû. Dı we salên cuntayê de lı Diyarbekırê Bayındırlıxê de dıxebıtiya. Cuntayê Faşist wek tevi welatparêz, demokrat û sosyalistên Kurdistanê, surguna wi ji derxıst,

xwest ku wi bışine Samsûnê. Bı wi awayi dewlet dıxwest ew jı nav gele xwe durkeve û her weha xebatên xwe yê peşveçûyi neyne cih. Lê belê Kek H. Sait dev ji xebata Bayındırlıxê berda, neçû Samsûnê, lı Diyarbekırê û Lıce xebatên welatparezi dom kır. Cuntayê Faşist dı sala 1983'an de lı meha Adarê de wi gırt bıncav û bı rojan eza û cefa lê hat kırın. Hevalêki zana û tégıhişti bû. Zordestan bı dara zorê, bı elektrikê,

bı her cûrê lédan dıxwest ku ew bine ser meslehata xwe. Kek H. Sait bı baweriyek xurt ber xwe da.

Cuntayê faşist ev xıst gırtigeha bı nav û deng "5 nolu" yê. Deh sal û heşt meh "ceza" dane pê. Kek H. Sait Çar sal û niv lı gırtigeha "5 Nolu" yê de ma. Gelek teda, eza û cefa lı wê de rê ji dı. Pışti, dı

sala 1988' an de jı gırtıgehê derket, nexweşıye ku jı gırtıgehê gırtıbû, hêdi hêdi derket holê. Nexweşıya bê derman wi roja 29'e Nisan'e de (sal 1992) jı nav hevalên wi û jı nav tekoşına gel pır zû bı heqıya xwe.

Belê, mırın jı bo Kek H. Sait pır zû bû. Lê em bawerın ew cihê xwe dı nava qefla şehidên me da û gefla şehiden Kurdistanê de gırt. Em heval û hogırên wi tu car tekoşına wi, hêjabûn û rûmetiya wi jı, bir ve nakın. Jı bo me ew her dem dıji.



Gul meгри
Gul meгри
Gul yeke ne ar
Gul kırın ar par